


# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



## NAVEROK

|  |    |
|--|----|
| Şehidên Kurdistanê nemir in.....                                       | 3  |
| Raporeke dewleta Tîr derbari Serhildana Şêx Sait da-Werger: Baran..... | 4  |
| Helbestvan Rêkêş Amedi- Amadekar Xelil Dihoki.....                     | 11 |
| Encumena Niştimani ya Kurdistanâ Iraçê.....                            | 13 |
| Hevpeyvin bi Seydayê Keleş ra - B. Dersim.....                         | 16 |
| Mem û Zin-Radyo dramatik, Robert Alfton.....                           | 19 |
| Gotûnên Pêşıya.....  | 21 |
| Jî Zargotîna Me - Du stran.....  | 22 |
| Rexnegiri yan çavnebari- X. Lezgin.....                                | 24 |
| Terminoloji.....   | 26 |
| Tiyatroya Zarokan - Ciwanik- A.C. Campola.....                         | 28 |

Berge pêsin: "Relifeke Mithras u Herakles"  
nezi Kolika (Kahita) kevri, li çiyayê Nemrûd

Sal: 13

Hejmar: 78, Çırıya Paşin 1992

ISSN 0283-5355

**XWEDI:** KOMKAR-Swêd

**BERPIRSIYAR:** Şêroyê BOTAN

**NAVNIŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr  
161 36 STOCKHOLM

**TELEFON :** 08/26 23 75

**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska

Arbetarföreningen

**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş. BOTAN

**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.


161 36 STOCKHOLM

**FAX:** 08/25 38 57

# ŞEHİDÊN KURDISTANÊ NEMIR IN!



Dr.Seid Şerefkendi




Fettah Abdoli

Sekreterê Gîsti ya PDK-Î Dr. Seid Şerefkendi, Fettah Abdoli, Humayûn Erdelan û Nûri Dehkurdî dî 17'yê İlona 1992'an da li bajarê Berlinê bî destê dewleta Îranê hatun qetulkirin. Têkoşina gelê Kurd bî kuştin û dafikên dîjmin nayê rawestandin. Pêşeroj ya gelê me ye.

Em vê qetliyamê protesto dîkin û jî gelê Kurd ra serxweşi  
û aramê dixwazin.

**Redaksiyona Roja Nû**



Musa Anter

Welatparêz, nîvîskar û şervanê hêja **Mûsa Anter**, bî destê dîjmin-nêñ gelê Kurd dî 1992.09.20 da li bajarê Diyarbekir hate kuştin. Em vê qetliyamê protesto dîkin û jî gelê xwe ra serxweşi dixwazin.

**Redaksiyona Roja Nû**

**Piştî Şorîşa Şêx Seid  
Rapor û Tevdirêن Tîrkan  
Dî Derheqa serhildanê û Rewşa Kurdistanê da**

**BEŞA III.**

**“DIVÊ EM KURDISTANÊ  
BI DESTÊ WALİYÊ GIŞTİ Û  
WEK MISTEMLEKE İDARE BIKIN”**

**Werger: BARAN**

**Rapora Cemil Begefendi  
Vezirê Karên Hundur  
Derheqa Geşta Wi ya li Rojhîlatê**

Dî heqê rewşa Rojhîlatê (1) da û dî heqê isla-heta (reforma) ku nu dest pê kîr, mîn bî hîn walîyan ra (Diyarbekîr, Mêrdîn, Sêrt, Ruha, Xarpit (Elazîz), Ergani, Dêrsim), bî İzzedîn Paşa yê Mîfettişê Ordiya 3. ra û bî heyeta Mehkema İstiklalê ya Şerqê ra dî 11-17 Hezîranê da li Diyarbekîrê civinek çêkir û ez bir-baweri û rayêñ ku dî vê danustandinê da hatun eşkerekirin û tevdirêñ ku hevce ye bêñ girtûn li jêr pêşkêsi we dikim:

**Kamrani (Esais-Reheti)**

Piştî cezakırına *mutegallibe* (2) û serokan, rewşa rojhîlatê, ji bili hîn ciyan, ku bermayıyên aseyan (wek Broyê Têlli li Gîridaxê Bazidê û Yado li Çiyayêñ Darahêñ) hin lê seri dîkişinîn, gor berê bêdeng û rehet xuya dîke. Lê belê, ji ber komkîriña

çek û sîlahan û nefikirina kesan ber bî rojava (3), hîn Kurdêñ ku dî dema serhildanê da piştgiriya hukumetê kîrine aciz dîbin. Jî ber vê yêkê, her usa ji bî tesir û propaganda wan revokêñ li Îranê, gelek kes ref bî ref derbazi Îranê bûn. Jî ber vê, iro sinorê Îranê bûye warê kar û xebata qolêñ Kurdparêzan.

**Kar û Xebata Kurdparêzi**

Rêxistîna dervayî (ya Kurdan) gelek çalak e. Êhtimaleke mezin e ku Ingîliz, Fransız û Îrani alikariya Kurdan dîkin. Lî Iraqê dî bin perê Ingîlizan da, li Îranê jî dî bin perê Rîza Shah da kar û xebetêñ ji bo Kurdistanâ serbixwe xuya dîke. Heya Ingîliz li Iraqê, dixwazin Ereban bî Kurdan bîdin sekinandin û bona vê yekê, Kurdan ji bo serxwebûnê kîş dîkin. Lî sinorê Sûriyê baweri bî Fransîzan nabe.

Herçiqas meriv dikare bêje ku dî serhildana dawi da tesireke bir û baweri (mefkurewi) tune ji,

bı rasti di mîntiqâ rojhilatê da Kurdparêzi heye û bı kar tê. Lê dî warê bir û baweri da hin ne ewqas kûr, fireh û bı xeter e. Lî rojhilata xeta Wan û Midyatê bir û baweriya Kurdparêzi, daxwaza serxwe-bûn û cudayeti xurttir e. Gel bı zman û milletiya xwe ra bı xurti xudi derdikeve. Herçi birewer bı tevayı Kurdparêz in. Dî mekteban da salixdana welat bı şikleki xas û giştî, esaseke bir û baweriya Kurdparêzi ye. Bir-baweri û tevgera Kurdiyyê gelek misaid e ku bı rê û olaxên zaneti xurt û fireh be, ber bı pêş biçe. Armanca me ya esasi ji ev be ku, emê tevdîr bîstînîn û bîxebîtin, da ku bir-baweri û tevgera Kurdiyyê dî mîntiqâ rojhilatê da bîtemirinîn, nehêlin xwe bigihine rojavayê Feratê, bajon ber bı sinorêñ rojhilat û başûr (cenûp) û ji wê bavêjin der.

### Islahet (Reform)

a- Ji Gulana sala 341 (1925) heya nuha, tenê 60 hezar çekê şer hatiye komkirin. Lî Dêrsimê hin dest bı karanina zorê ne hatiye kirin. Ji eşirêñ ser sinoran ji hin çek ne hatiye komkirin. Anglo Dêrsim û eşirêñ ser sinoran li derva mane, lê disa ji çekê ku hatiye komkirin gelek kêm e û şık tune ku çend qati wê ji maye.

b- Ew kesê ku hatine nefikirin, bı kıryarêñ xwe zîrar dîdane sazûmana civaki, li xelkê zulim dikirin, dî bin perdê hukumatê da nîfûza xwe bı xîrabi kardanîn û gelek zîrar dîdane hawîrdorê xwe û diji islaha rojhilatê derdîketin. Anglo bı awayeke giştî, ne dibû ku li vir bîminin. Eva salixdana wek emir e ji bo bona neqîlkirina merivîn xîrab û zordest. Ev emir ji bo wan mutegallibeyan e di warê idari, abori (selefdar), êtiqadi (şêx), serokeşir û axayan (kesêñ xwedî 5-35 gund) e. Ji vana hersêy-ên dawi (şêx, serokeşir û axa) nefiyê xerbê (rojavayê) bûn. Usa minasiw hate ditin ku heya ji ortê rakırına eşirtiyê bı tevayı, têkili serokên eşirêñ koçer nebin. Ji van pêve, eger mutegallibê nebîn ji, ew kesêñ ku rûniştina wan li şerqê ji bo sazûmana civaki bı xeter e, ew kesêñ Kurdparêz û serseri û malbatêñ revokan û yêñ ku mehkûmi cezaya ji

mehki zêde bûne û dî zindanê şerqê da dîminin, ev hemû neqli xerbê bûn.

Kes ne razi ye ku, sedem çi dîbe bîla bîbe, ji wan kesêñ neqîlbûyi yek ji vegere ciyê berê. Heya misade tune ku li vir mehkeme bin. Ew kesêñ ku piştî neqîlbûnê dî heqê wan da dawe vebûn, ji bo mehkemê nayêñ xwendin, û mehkema wan li ciyê nefiyê tê temamkirin.

c- Ray ev e ku, tevi cikirina wan kesêñ nefikiri li xerbê, divê malbatêñ wan ji piştî bêderan bêñ neqîlkirin; ev yek wê nişan de ku hukumet karê destpêkiri nivçe nahêle; xasîma, dûrxistina serok û şexan ji şerqê, tesireke mezîn wê bike ji bo vemîrandina bir û baweriyêñ Kurdparêzi. (...) Eraziya van kesêñ nefikiri, divê piştîre ji wan bê stendin û li kesê muxtac bê belavkirin (...)

d- Divê hukumet alikari û piştgiriya Tirkêñ vê mîntiqê (şerqê) bike û ji derva Tirkêñ macir bî komiki bîne û li vir bî ci bike; Banka Zireetê (çandîniyyê) dî dêndayinê da pêşiyê bide Tirkân. Ji bo neqîlkirina maciran ordi û idara sivil çi ji dest tê wê bike û xelk ji alikar be; dîgel vê alikariyyê, ji bo her maleke macir -bona neql, xani çekirin, xwarin, heywan, halet û toxim- 300 lire mesref hewce û ferz tê ditin. Anin û ciwarkirina maciran, bê pere û bê alikari nabe. Eger isal pere bê ditin, meriv dîkare li Ruhayê 250, li Diyarbekrê 400, li Sorekê (Siverek) 100, li Xarpitê (Elazîzê) 250, anglo bı tevayı hezar xane ciwar bike. Piştî wê ji hersal, meriv dîkare li wilayetêñ valabûyi (ji Kurd û Ermeniyan) 5000 mal ciwar bike û bı vi awayi li vê mîntiqê pîraniya Tirkân pêk bîne û Kurdparêziyyê bîtemirine.

h- Piştî neqîlkirina mutegallibe û kesêñ xîrab -ku hêvi heye, heya dawîya Tirmehê ev kar temam be- divê misfettişi daxuyaniyekê derxe û ji gel ra bide zanin ku êdi neqîlkirina kesan gihaya dawi û dî çavê hukumetê da gel himwelatiyê rast e û parastin, reheti û mafêñ wi bı vi şikli, bı hukumetê ra, bı idara Komarê ra girêdayi ye.

Bı vi awayi, divê siyaseta zordanê êdi bîghê dawi û tevdîren gîran (fewqîlade) hêdi hêdi bêñ rakirin, li ciyê wan jiyana adi (tebii), reheti û be-

dengi dî şunda bê.

Bona vê yêkê ji, divê beri hertiştî hukmên idara şidandi bê sistkirin û ji wilayetên rojava dest pê bike û idara zori gav bî gav bê rakırın.

v- (4) Waliyên ku tevi civinê bû bûn, gotin ku, ji ber ku idara şidandi dest daye ser gelek heq û se-laheyetên memûrên mîlki û li wilayetan hemû kar û bar bî destê qumandarên leşkeri tê rastkirin, heyâ xelk dî navbera sinorêne qeza xwe da ji mecbûr dîmine bî wesiqe û teskera nifûsê biçe û bê. Bona ku ji vê usûlê tu feyde dernayê û serda ji ew zîra-rênen abori (iktusadi) û dijayediyen idari pêk tine, bî destê me hat rakırın.

#### 4- Rêxistin û Bir û Baweri

1- Avakırana mifettişyeke giştî li Rojhîlatê, bî selayehiyeteke fireh û botçeyeke xas (ango sazkirina walîtiya giştî û idarekirina Rojhîlatê bî usûl û qeydeyên mustemleketi) -raya heyeta istıqlal- (5) herçiqas bî her awayi bî feyde ye ji; bo avakırana rêxisitineke han pere û wext lazim e û heyâ wê demê dî navbenda (merkeza) mufettişya Ordiyê da beşen (şûbeyên) kamrani (esayış) û istihbaratê bê çekirin û sazûmana civaki ya Rojhîlatê dî bin dest û idara mufettişiyê da bî rîva biçe, têri dîke (6). Bona ku, dî vi kar û bari da alikariya mufettiş bê kîrin -nuha dî meqerê mifettişiyê da mifettişê mîlki Heci Husni Beg bî vê wezifê mijûl e- divê sê mifettişê mîlki û du zabîten cendirme (binbaşiyek û yuzbaşiyek bî qidem) dî bin emrê wi da kar bikin. Xasîma, ji bo ku pêsi li tevgera Kurdparêziyê bê girtin û xelk idara Komari ya Tîriyê bî tevayî nas bike û jê hez bike, divê rêxistîna istihbarete û propagandê pîr û pîr xurt û fireh be û bona vê yêkê, bo waliyan, her usa ji bo mufettişiyê, her sal kêmayı da 25 000 lire bedêl hewce ye û ferz e.

2- Jî bo ku ev islaheta Rojhîlatê bî hêsanî bî rîva biçe û esasen Komarê (Cumhuriyetê) zû fireh bin û ciye xwe bigrin, divê li mintiqê zêtir nehiye bênen teşkirkirin; nifûs, mal û erazi bê nivisandin; kar û usûlîn beşan (vergi) bênen çêtirkirin û xasîma kar

û xebatêna dadigehan (mehkeman) ku dî rûbari hin usûl û qeydeyan da gelek giran dîmeşe û li ser xelkê bê tesir e, divê bê islah kîrin.

3- Memûrên ku ji merkezê têne tayinkirin, wexta xelkê Rojhîlatê bin, bî pirani zîrara wan tê ditin. Bona vê yêkê:

A- Memûrên serok (amîr) divê bî temami ji rojava bin û Türk bin,

B- Dî dadigehêne idara şidandi da hakim û memûrên esker û sivil divê tucar xelkê rojhîlat nebin,

C- Mumûrên dereca duwemin ji divê ji xelkê wi wilayeti nebin,

D- Memûrên poste û tîlgrafê divê ji xelkê rojhîlatê nebin,

E- Memûrên ku bî eslê xwe ji Rojava ne, lê, ji ber ku, gelek waxt li Rojhîlat mane û êdi ehlaqê mintiqê (yê Kurdan) girtine, divê bîn guhirandin,

F- Zabîten cendirme û hêzîn ser sinor û polêz divê bî temami Türk û ji Rojava bin.

G- Pêşniyarê li civinê û raya min bî xwe ji ev e ku, memûrên heyi yêne ji vê mintiqê (Kurd) hema nuha neqli Xerbê bin û bî vi awayi tasfiye bin (nemînn); ji vana tenê memûrên dereca duduyan neqli bajarêne ciran bin.

4-Jî ber ku cendirme bî hejmar û bî çawani (wesif) ne gor rewşa Rojhîlatê ye, ev yek zîrare dide êtibara hêzîn eskeri.

A- Dî nav eskerê nu da yêne ku ji bo cendirme-tîne têne vegetandin, divê gor qanûna eskeri bî kêri cendirmetiyê bê û xasîma, xwendin û nivisandinê bîzanibe,

B- Divê mesref û meaşê cendirman beri hemûya bê dayin,

C- Lî rojhîlatê dî hêzîn leşkeri da, herçî zabîten ku kêm in, divê ji hêzîn rojava bêne stendin,

D- Divê cendirme ji kar û xizmeta bela-wela bê xilaskirin û gor imkan û kar li ser hev be,

E- Jî wan alayê seyyar li rojava, divê qismeki nu ji rojhîlatê ra bê şandin,

F- Heya ku midûr û qelemîn (dairê) tahriratê

(nivisandinê) bêr rakîrin, ji bo karê şifrê û nivisandinâ veşarti divê zabiteki cendirme wek arikar bîdin bîn emrê waliyan.

Jî ber ku ev pêşniyar ji bo kamraniya rojhilate gelek lî ciyê xwe bû û ne yê derengxistinê bû, bona temamkirina kadrên zabitan me dest bî kar kîr.

5- Herçi serokên (amîrên) mîlki, divê gor karê xwe xwedi selahiyet ji bîn; lê gele selahiyetên wan, gor qanûnên cuda cuda hatiye rakîrin yan ji tengkîrin. Divê gor hewcedariyên roja iro qanûnêke nu ji bo İdara Gîsti ya Wilayetan bê derxistin û di navbera wê û qanûnên dinê da hemahengi û wekhevi pêk bê. Di civinê da ev pêşniyar ji hate ser zmin û Wezareta me ji di vê rayê da ye.

6- Meaşen serokên memûrên mîlkiyê ne gor şan û şerefa mîqamê wan e. Bona vê yêkê, divê wali ji mesrefa beşa rê û ya xwendîna pêşin, bî na-vê “bedêla stendîna beşa rê û ya xwendînê” bedêlekê ji idara xusûsi bistinîn û ev bedêl qasi meaşheri mezîn yêndamên (azayêñ) encumenan be. Ev yek tesireke baş bîke lî ser waliyan û kar û xizmeta wan çêtir bîke. Ray ev bû û wezarete me ji bo vi tiştî ci lazîm e kîr.

7- Jî ber ku li rojhilate mektebên nizami kêm in û yêñ heyi ji ne baş in, memûrên dewletê di ali xwendîna zarokên xwe da ji di rewşike gelek çetin da ne. Daxwaz ev e ku, zorokên memûrên ku li rojhilate xizmet dîkin, bî pereti yan bê pereti be, bikarı bîn di mektebên İstembolê da bixwinin, hukumet di vi wari da ji wan ra hêsanî nişande; her usa ji, li rojhilate alikariya mektebên baştı bike, da ku ew ji bî dilek rehet karê xwe pêk binin.

8- Giraniya sazgeha têlefonê li Rojhilate eşe-kere ye. Xelk gelek dixwaze ku xeta têlefonê çêbe û tûm bixebite. Em ku carcara ji xelkê mintiqê alikariyê distinîn, eger barê wan zêtir gîran nekin û gor qanûna komkîrîna alikariyê bikin, di heqê vi kari da têñ.

9- Him ji neparastinê, him ji, di rûbari serhildan da li vê mintiqê di piraniya dairên dewletê da kulliya qanûnan tune. Herçi sûretên qanûn û emîrnâmîn ku bî şapoxrafê têñ şandin, ew ji bî

wext ji ronahiyê wînda dîbe û nayê xwendin. Bona vê yêkê, qanûn û emîrên ku ji nehiyan ra têñ şandin divê çapkiri bîn û wek kîtêb dî dosyê da bê komkîrin û ji kulliye ji, bo hemû wilayetan, gor hejmara qeza û nehiyên wan divê taxîmek bê şandin.

10- Pêşniyar bû ku ferqê navbera perê kaxiz û ya madeni bê hilanin. Lî di dawiyê da em gihiştin wê neticê ku, ev pîrseke gelek mîhim e û divê ke-sen pîspor lê binêrin.

12- (7) Ew kesen wek Tahirê serokê eşira Mîran û Millîyan ku ji gelek serhildan û curman gunekar û mehkûm in, diji dewletê çek bî kar anine û revine Iraq û Sûriyê, divê ji himwelatiyê bê avêtin, eger malbata wan li nav sinorêne me maye, divê ber bî xerbê bêne nefikirin û malê wan ji wan bê stendin û bibe malê xeznê, eraziya wan bî destê hukumetê bê parastin û idare kîrin. Ray ev e ku, tevdîrê hanê nîfîza wan kesan bîskîne û çavê wan bitirsine yêñ ku mîyla wan heye esayaşa mintiqê xirab kîn.

13- Em hemû bî hevra gihiştin wê neticê ku, mesrefê ku lazîm e ji bo İslaheteke esasi li rojhilate, divê ji gelê mintiqê (ango ji Kurdan) bê stendin û bona vê yêkê qanûneke xas bê derxistin.

Ev hemû tiştîn ku min bî kurtahi pêşkêş kîrin, ray û pêşniyarên Serokatiya Erkanê Herbê Gîsti û ya Vezareta me bî hevra ye di derheqa İslaheta rojhilate da û ci anîna wê edi dimine ser raya we ya bilind.

## BERNAMA (PROGRAMA) ISLAHETÊ JI BONA WİLAYETÊN ŞERQÊ

### Beri Hertişti Pêkanîna Yekîtiya Netewi

Lî rojhilate wilayetênu warê Kurdan in û çav-kaniya fêsadî û şorîşê ne li ser sê mintiqeyan parva dîbin:

1- ji Çemê Feratê û rojavaya wê bigir heya Ba-zid (Beyazid) û Xînis û Kemah; bakûrê vê xettê,

2- Başûr û rojhilata xetta Wan û Midyatê,

3- Wilayetê di navbera van herdu xettan da

(herdu xetênu ku dî bendênu jori da hatin nişandan).

Lî mintiqeya yekan : Wek Bazid - Xînis - Gêxi - Umraniye - Kahta - Potirge - Bazarcix ku tê da gundênu Kurdan gelek in, macirênu Türk li vê mintiqê wê bêni ciwarkirin; dî gundênu Kurdan da hukum wê derbazi Tîrkan be û mixtar ji Tîrkan bê hilbijartın; Kurdê ku ji besen dewletê tim direvin wê mecbûr bin serê xwe bi temami nîzîm bikin; Tîrkên mintiqê ku ji nezani û bêhayî milletiya xwe winda kîrine, ruhiyeta wan bê geşkirin; dî navbendênu qeza û wilayetênu vê mintiqê da rêxistinêni millî yênu xurt wê bêni avakirin; li ser himê zanyariyê (maarifê) propagandeyeke baş wê bê kîrin û dî saya van tevdiran û dî saya iktisadê da tevgerêni Kurdparêzi wê bêni vemirandin. Gundênu ku li ciyen gelek asê ne û xelkê wan ji eşqiyati û zordesti dev bernadin, ew gund ji divê neqli deştan bin û xelkê wan yeko yeko li gundênu Tîrkan bêni belavkirin.

Lî mintiqeya duduyan wilayetê Hekkari û hin qeza, ji xwe, ji berê da tabiyê idareke serbest in û li wan deran tucar idareke rêk û pêk saz ne bûye. Lî vir qet bajarek ji tune ku bibe navbend ji bo bajarvaniyê (medeniyetê). Ev der warê eşirênu koçer e ku havin û zivistan tim tê da diçin û tênu. İdara Kurdi ya xas (xusûsi) ku İngiliz li sinorênu Mûsilî wê çebikin, ji ber ku ji vê mintiqê ra hevsinor be, gelek maqûl e ku tesireki li ser bîke. Ji ber sedemênu abori, siyasi û avadani ne lazim e ku li vir macir bêni ciwarkirin û ev serbestiya han bîla wek berê bîmine. Divê li qeza û nehiyan bi destê cendirme û memûren mintiqi idareyeke sıvik bê danin; divê ev gor hal û edetênu Kurdan sistemeke muweqqet be, da ku Kurd guh nedin İdara İngilizan; divê dî warê eskeri û besen dewletê da zorê nedine wan. Kesen ku meyla wan ber bi İngilizan û Kurdparêziyê heye, divê tevi malbata xwe nefiyê Anadoliyê bin. Yen ku piştgirê idara me ne û ji me ra sadîq in divê bêne parastin, çekê (silahê) wan neyê stendin, ji wan ra deriyê menfeetê bê vekirin û bi riya wan herçi xain û casûs bêni eşkerekirin. Lî vir rêxistinêke fireh ji bo xwendinê, dadiyê (adliyê) û hukume-

tê ne hewce ye. Merivênu asê û eşqiya bi bombebaranê teyaran wê bêni cezakirin û tırsandin.

Dî wilayetêni mintiqâ sisêyan da, ji ber ku Kurd piraniyê pêk tinin û Türk tenê sisêyan da yek in û ev der hêzen dewletê yêni siyasi, abori û leskeri gelek telef dike, bona vê yêkê, divê ev der rojki berê bi macirênu Türk bê ciwarkirin û dî nav pênc salan da piraniya Tîrkan bîghê duduyan ji sisê. Ev macir berê li gundênu Ermeniyan yêni vala, li çitligêni istimlak kiri û li eraziyêni din û gor usûla jêrin bêne cikirin.

1- Ji macirênu Türk yêni Romanya, Bulgaristan, Sîrbistan salê 40 hezar nîfûs li mintiqeya Ruha, Mîrdin, Sorek, Diyarbekir û 30 hezar nîfûs ji wan maciran li mintiqeya Xarpîte, Kemahê, dorberê Feratê, Erganiyê, Paloyê, Gêxiyê; qismek ji van maciran, qismek ji Qerepapakênu Rûsiya û Azeriyan û Qafqasiyan 30 hezar nîfûs wê sewqi wilayetêni Wanê, Mûşê û Bitlisê bîbe û li wir bê ciwarkirin. Bi vi awayi, dî pênc salan da li mintiqâ sisêyan nîv milyon nîfûs ciyê Ermeniyan digre û hukma Tîrkan di warê abori û siyasi da pêk tine. Ew gundênu Ermeniyan ku ketiye destê Kurdan, divê ji wan bigrin û bidne maciran û macir gund bi gund bi komiki bêne ciwarkirin; dî warê avadani, çandini û ciwarbûni da alikariya heri mezîn ji wan ra bê nişandan. Eger hewce be, divê bo parastina nefsê xwe bi senet çek bîdinê û eskeriya wan du sal bê tecilkirin. Midûriya ciwarkirinê divê botçeya xwe bi temami ji bo vi kari serfke.

2- Bajarênu mezîn û piçûku ku nîfûsa wan bi temami Türk e, divê bi marifeke xurt û bi riya ocax û spor û rêxistinêni ciwanan bibin navbendênu herbê û bi çap û weşan, bi mekteb, bi tiyatru û bi listikênu netewi û gişti, dî warê netewi da heyecana gel bê bilindkirin; his û edetênu Tîrkan bê jiyandin. Dêrsim, Qerekeçi, Gêxi, Bismil û hwd... ku Tîrkîtiya wan ji berê da tê zanin, lê piştre bûne Kurd û qebilênu hisen wan ên netewi sist bûye, divê bi alikariya weşan û konferansan, bi bertil û bexşîş cardin vegerinin Tîrkîtiyê û Kurden ku mîyla wan ber Tîrkîtiyê heye, divê vi ali da wan teşwiq bikin.

Bajarêن wek Sêrtê, Mêrdinê, Midyatê û hwd. ku Erebi dipeyivin, divê wan ji vegeerin ser çanda Tirkî û dî bajaran da ji bili Tirkî, xeberdana zmanen din bî rê û olaxên zorê û idari qedexe be. Her usa ji, divê bi gotin û telqin li ser vicdana wan tesi-rek bê kîrin. Macirêن Türk ku wê bêñ, gor sınıfêñ xwe, divê berê dî bajaran da û dî gundêñ dora wan da bi sixleti ciwar bin. Bi vi awayi navbendêñ çandi sal bi sal xelekêñ firehtir pêk binn û dî dawiyê da bîghen hev û Kurdêñ ku dî çiyan da, dî ciyêñ asê da mane dorê li wan bigrin. Divê dî bajaran da dibistanêñ şevin (leyli) bêñ vekîrin û zarokêñ sêwi tê da bêñ terbiye kîrin.

3- Lî Diyarbekrê bi alikariya malmezinan qasi du-sê hezar Ermeni kom bûye û dî bajaran din da ji Ermeni, Suryani, Gîldani, Nestûri û xristiyanêñ din hene. Jî zêdebûn û sixletbûna wan tîm bêoxiri çêbûye û tîm bûne haleteki xirab dî destê Ingilizan da. Bona vê yêkê, divê pêsi li wan bê girtin û ji bona derxistina Suryan û Yêzdiyan ji mintiqê hin sebep bêne ditin.

4- Gelek Kurd ji bo karkeri (emeleti), hemmali, rîncberi, eskeri û ji bo sebebêñ din têñ Anadoliyê, İstembolê û bajaran din. Divê xebat bê nişandan, da ku Kurdêñ han li van deran bîzewicin û ciwar bin. Divê tîm hatuna karkerêñ Kurd bê teşwiq kîrin, ji wan ra asani bê nişandan û nehêlin ew şunda vegeerin. Divê Kurdan dî eskeriyê da bidin sınıfêñ demdirêj wek topavêj, cendîrme û suwari û bîsinin rojavayê Anadoliyê û Trakyê. Divê dî rojava da wan teşwiq bikin bo cendîrmetiyê û bi Tîrkan ra bîzewicinin.

5- Divê xebateke xas bê nişandan, da ku ev abori û senayiyê dî destê parazitên ne Muslim û ecnebi da ye, bi tevayı bikeve destê Tîrkan. Divê bi destê banke, şirket û ticaretxaneyêñ milli bîghen vê armancê. Tenê bi hukmeke abori ya rasti meriv dikare yekîtiyê pêk bine.

### Ya Duduyan Avakırına Hukumetê û Xweşkirina Esayış e

1- Lî mintiqeyêñ dudu û sisêyan divê idara

şîdandi her hebe. Divê li Anadoliyê, li mintiqeyêñ dinê ji mifettişiyêñ giştî bêne sazkîrin û dî nava wan da, Mifettişiya 5. ji bo vê mintiqê be û waliyêñ mintiqê bi aliyê esaiş, sazûman û islahetê da bi mifettişiyê va bêne girêdan. Divê ji bo alikariya wi dî warêñ dadi (adli), idari û eskeri da memûrêñ nu bêne tayinkîrin, da ku karêñ ceza, huquq û parastinê zû bi rîva biçin. Qumandarê Qolordiya Heftan bi aliyê parastina giştî wê dî bin idara mifettişê giştî da be û serokatiya şîdandi bîke.

2- Diji propagandeya ecnebiyan ku dî rojhilate da me gelek aciz dîke, divê rîxistîneke xurt dî warê istihbarete da bê avakîrin û ew bi dû casûsêñ dijmîn keve, li der û li hundir wan bê tesir bîke. Bona vê yêkê, divê memûrêñ pispor di vi wari da bêne xebitandin, bexşîş û xelatan bîdne wan, rojname û kitêbikan çap û belav bikin, konferansan saz bikin û bo van karan bedêleke geleki mezîn û veşarti bê veqetandin. Dî vi kari da, divê ji hemû rîxistinêñ dewletê bi xurti bê istifadekirin û Erkanê Herbê Giştî, divê ji bo propagandeya giştî hedefan nişan de.

3- Divê hemû çek bêne komkîrin û kes bê wesiqe bi xwe ra çek negerine. Tenê, me çawa li jorê goti bû, ew kesêñ ku bi hukumetê ra sadîq in, ew û macir wê bikarîbin bona parastina xwe bi wesiqe çek bistinîn.

4- Dî mintiqâ sisêyan da divê mutegallibe, şêx, derebegêñ berê, eşqiya, asê, hevalbendêñ ecnebiyan û Kurdparêzêñ berbiçav tevi malbata xwe nefiyê rojava bin. Jî van kesêñ xirab, yêñ ku hin revok in (firari ne), divê malbatêñ wan li ci nemine û nefiyê Anadolê be. Ew gundêñ asê û çiyayı ku talan û şêlandin xwe ra kîrine adet, divê bêñ rakîrin û li Trakyê û Anadolê bêñ belakîrin. Divê qet gun-dek ji nemine ku bîbe parêzgehê eşqiatiyê.

5- Qitayêñ Qolordiya 7. û cendirmeyêñ seyyar û sabit divê bi hejmar xurt bin; du bêlikêñ tabûrêñ sinor li şunda û serhev be, hejmara wan heryeki derkeve heft sedi; li bakûrê Wanê dî sinorê wala da tabûrek nu bê çêkirin. Lî Wanê divê tûgayeke çiyê bê sazkîrin û tûmenêñ zirxi, her yek otomobi-

lek zırxi ji bıstinin. Lı ser sinorê Sûriyê, bona ku pêşî li karê qaçax bê girtün, divê dî bin emrê idara gumrikê da bêlikeke otomobilên zırxi hebe. Ü divê tûmenê eşiran bêl belakırın û li ciyê wan tûmenê suwari yêñ êhtiyati bêl sazkırın.

6- Divê nifûs, mal û erazi rojki berê bê nivisandin û istatistikên baş bêl çêkirin; bî awayeki ciddi le ser danin û berhevkirina besan bê sekînandin, da ku emrên hukumetê bî tevayı bî ci bêl; li mintaqeyêñ serhildanê besen giran wê bêne danin; gelek kesen ku dora wan hatiye lê neçûne eskeriyê, yan ji bî temami ne hatine nivisandin, divê bî xurti li ser wan bê sekînandin, ew bêne komkirin û ew dî xerbê da û dî rêyan da bî darê zore bêne xebitandin. Me jorê da ji goti bû, ji Tirkêñ mintaqê û ji maciran ra asani wê bê nişandan.

### Ya Sisêyan, Sazkırına Hatîn u Çûnê û Pevgirêdanê ye

1- Xetta Keller - Ergani - Diyarbekir divê rojki berê bê çêkirin û bî xetta Sêvas - Erzurumê ra bê girêdan. Dî çêkirina riya hesin da divê kar bidin maciran û ew rojki berê bibin hasîkar û seranseri xettê gundêñ Tîrkan yêñ xurt bêl avakîrin. Bona çêkirina vê xettê, meriv dikare para hukumetê ya dî madenê Erganiyê da wek bedel nişande û şirketa Ergani û hin şirketê din hema dest bî kar bikin.

2- Riya Xarpit - Dêrsim - Erzinganê û ya Mêrdin - Heskif - Garzan - Bîtlisê ji bo derbazbûna erebeyan divê bê vekirin û xelk dî van riyan da bî darê zore bê xebitandin. Dî derheqa vê yêkê da rapora mihendizê wilayetê Diyarbekrê me da Wezareta Avadaniyê.

3- Xebitandına gemiyan dî gola Wanê da û tezekirina tersana Ernisê, him ji bo ciwarkirina maciran, him ji bo xweşkirina aboriya mintaqê feydeke mezîn wê bide û bî aliyê eskeri ji pevgirêdaneke lezik pêk bine. Dî vi wari da ray û ditinêñ heyi me da Wezareta Avadaniyê.

4- Ji bo pevgirêdaneke lezik ji poste û rêvingiyän ra, divê dî navbera Diyarbekrê û Wanê da teyyare bê xebitandin. Pêşniyarek usa ji şirketa

Yunkersê ra hatiye kîrin.

### Pêy Ketin û Qontrola Rewşa Giştî

Ev program dikare û hewce ye dî pênc salan da bî kar bê. Ji bona ditina pêşveçûna wê sal bî sal, divê karêñ her sali, dî wextê da bêne nişandan û di dawiya salê da, mifettişya giştî, karê ku hatiye kîrin bî riya rapor û istatistikên fireh ji hukumetê ra bide zanin. Guhartinêñ ku dî programê da lazim e bêne kîrin, divê bî awayeki eşkere û bî sebebêñ xwe bêne nişandan. Heya ku izin û razibûna merkezê nebe, divê çarçuveyê esasi tucar neguhure.

### Têbini

(1) *Ji ber ku naxwazin bêjin Kurdistan, dibêñ "Rojhulat".*

(2) *Gotina "mutegallibe" di zmanê Turki da bi mana kesen zordes û derebeg bî kar tê. Lı vir bi mana mir, axa, şêx û serokeşirêñ Kurdan hatiye gotin.*

(3) *Lı vir, gotina "rojava" gor Kurdistanê ye û ji bo navçe û rojavayê Anadolê tê gotin.*

(4) *Lı vir, dî sirê da divê xeletiyek hebe; dor ne yê "v" ye, yê "i" ye.*

(5) *Ji vê gotinê muraz, heyeta "Mehkema Serxwebûnê yê Şerqê" (Şark İstiklal Mahkemesi) ye.*

(6) *Lê pur ne bori, li Kurdistanê "Mifettişya Giştî" (Umumi Mifettişlik), ango "walutiya giştî û idara mustemleketiyê" saz bû û bî salan ajot. Herçiqas, pistre mifettişî rabû ji, ev idara mustemleketiyê ma, ajot û heya iro hat.*

(7) *Min bî zaneti bendê (11) venegerand, ji ber ku dî derheqa wextê karkirina rojane da bû û tu eleyeqeyê xwe bî babeta me tune bû.*

(Dûmahik heye)

### SERRASTKIRIN:

Dî hejmara berê da, "têbini" hejmar 10. da, bî şashi usa hatiye nivisandin: "Mebûsê Türk bî merhemet û bî vicdan e." Rasti usa ye:

"Mebûsê Türk bê merhemet û bê vicdan e".

Bibexşinin.

## Helbestvan

# RÊKÊŞ AMÊDİ

Amadekar : Xelil DIHOKİ

Navê wi yê dirust Zeki Mehemed Sedula ye. Dı sala 1956'an de li havin geha Silavê, bajarê Amêdiyê jı dayik bûye. Lı Amêdiyê xwendiyê û dı sala 1977 de xwendegeha mamostetiyê li Dihokê bı dawi aniye. Her jı sala 1975'an pê de, dest bı nivisina helbestan kiriye û dı kovar û rojnameyên Kurdi de belav kırine. Endamê Yekitiya Niviskarêñ Kurd e li Kurdistanâ Iraçê. Dı sala 1985'an de, yekemin diwana xwe bı navê "Lê venabîm" çap kiriye.

Me ev hevpeyvinê dîgel kiriye û dê çend helbesten wi ji, jı tipêñ Erebi wergerinun ên latini.

Nîha ji li Kurdistanê ye.

**Pîrs:** Kengi û bo çi te dest bı nivisinê kiriye?

**R. Amêdi:** Mı dı sala 1975'an de dest bı nivisinê kiriye. Dûriya min jı Amêdiyê û her wîsa jı day-baba û kes kara, bûne babet bo nivisinê.

**Pîrs:** Barê edebê Kurdi evro çewan e? Helbest, çirok û rexne.

**R. Amêdi:** Bı hizra min torê Kurdi, her ber bı pêşketinê diçit, nexasima helbest û çirok. Lê rexne ya lewaz e.

**Pîrs:** Hizra te li ser edibêñ derveyê welat çi ye? Wezifa wan çi ye û çi bikin baş e?

**R. Amêdi:** Ez wisan hızır dîkum ku hîndek jı wana xwe diwestinîn û xizmeteke mezîn jı bo milletê xwe

dîkin. Lê pêdiviye ku hewil bîdin û edebiyata Kurdi wergerinîn ser zimanê biyani, da ku bêtir milletê me bête nasin.

**Pîrs:** Tu bo çi mijûl i û pirojêñ te çine?

**R. Amêdi:** Min ev pirtükên jêri, jı bo çapê amade kırine:

1- Diwana helbesten nemîr Vehêl Amêdi.

2- Qeftek jı hozanêñ min.

3- Nivîstokek li ser fêrbûna zimanê Kurdi, bı tipêñ latini.

Yê ku hêjayı gotinê ye ew e ku, min babeten folklori ji kom kîrin e, lê mixabîn çi çapxane ninin ku bigehinîn çapê!..

**Pîrs:** Dı vi kawdana xirab de, dewra edibê Kurdi çi ye?

**R. Amêdi:** Ya pêdiviye ku her torevanek, hez û siyaneta xwe jı bo yekgirtuna vi milletê derbeder tîrxan bike. Pêdiviye ku dı vi kawdani de, berhemên me, weki amojgari û şireta bin, sexmerati bîlîndkirîna pîla roşenbiri li def cemawerê milletê Kurd.

**Pîrs:** Edebiyata biyani çi kartêkirin li ser ê Kurdi kiriye?

**R. Amêdi:** Tîştekê bêguman e ku xwendîna toreyê biyani, nexasima yê milleten pêşketi, sodeka baş jı bo me tê de peye. Çînku karwanê wan jı mîj ve ye ku daye rê û her ê ber bı pêş de diçit, lê me jı ber gelek egera, neşyaye

karwanê xwe bîgehinin çi qonaxa. Xwendîna hemi rengên edebî, mifayeke mezîn tê de heye, çînku em gelek tişta nîzanîn, belku bî xwe jî wan bigirin. Her wek goti: "Eger tu nezan i, tu çav bîde cirani."

## Kîrismîs

Belê belê  
Ev şeve şe li tîm bajarêt  
Vê cihanê  
Kîrismîs e  
Hemyan dawet û şahi ne  
Guhê hemyan yê li wê gavê  
Zengila diwazdehê  
Deng vedet  
Wa dî gel jiyan û evin e  
Çingçîngâ pêket meyê  
Ü dengê dehol û zîrnân  
Û bistirina stranbêjan  
Heki diwan vegirtine  
Hemi serbesta li cihanê  
Xatîr jî nexofya xwestine  
Belê ka hînk  
Werîn gelo...  
Me bibinîn  
Dî vi çerxi de, çerxê bistê  
Her digel nexoşiya evin e  
Ne evina misk û emberan  
Were binêre  
Hemi kevir û çiyayêt me  
Evroke baran e, xwin e  
Ne ku salê  
Bes carekê  
Ne rojekê... ne heyvekê  
Sêsed û şêst û pênc rojan  
Her ewa tazi û şin e  
Lî hemi bajêrât cihanê  
Salê carekê şevbêrin e  
Zarokêt me  
Hemi şeva jî bili rojê  
Şevbêri ne  
Belê mixabin ku gelo  
Ew kesê têr  
Hiç hay jî yê bîrsi nine  
Her kesê azadiyê dixwazit

Sêpêk û zindan û kuştin  
Hemi xwinxwar  
Bê guman dijmînên wi ne  
Deh kes xaniyekê ava kin  
Panzdeh Bekrok bîherîfînin  
Nê çi çara ewi xani  
Min hêvi ye jî çend hejaran  
Jî tîm bêkes û bendewaran  
Jî hemi...  
Lî wêre bin anku li çi waran  
Hemi rabin  
Bibîne yek dîl  
Tembeliyê çi wîc tê nine  
Kerb û kin xwindariyê  
Çi pêşketin tê de nine  
Hîzra xwe bikin  
Nê hîndi... li cihanê  
Ez bî Xwedê hemi Ari ne  
Vêca bes e, bîla bes bit  
Eger hemi  
Em hemi ku nebîne yek  
Me Kîrismîs  
Xwin riştine  
Xweşî û lezeta jî warê me  
Herdem jî me xatur xwestine  
Ne bûne yek  
Ne me çi rîka di nine  
Hîndi zîkrezek hebitin  
Yê tembel bitin  
Nelîvitin  
Nexweşiya nehewinitin  
Dê azadi berpêkêt xwe baş  
girêdet  
Dê kete xwar  
Jî ber revitun  
Hîndi ku ew bêhna xwe bîdet  
Ku hevalêt xwe bînitin  
Hevalê wi ji ew kes e  
Ku sêdarê dîhebînitin  
Dergehê xwe  
Jî bo nxweşî û xebatê  
Taq têlitin  
Da azadi bîçite jor  
Wê nexweşiyê derêxitin  
Ger xebat dit  
Dê jî dîl xo tê werinitin.

# ENCUMENA NIŞTİMANİ YA KURDISTANA IRAQÊ

## Rohnikırına İlana Yekitiya Federal

Dema ku Şerê Cihanê yê Yekemin râwestiya, neteweyê Kurd ji mina hemû neteweyên dîn dî bînê hukumdariya Osmani de berê xwe dîda hîndê ku hukûmetekê bo xwe dîrust bîke û ew bîbe serwerê xwe. Lî belê berjewendiya hêzên biserketi dî şer de ku kilita çareserkirinê dî destan de bû, tenê ku wi jî azadi bêpar hîst, herweha welat wi dabeşî pênc welatan ji kîr. Ev netewe nerazibûna xwe bî gelek şoreşan ji da diyarkirin.. Lî ser hîndê benda 62-64 jî besa çaran di Peymana SEWR'ê ya di dehê Tebaxâ 1920'i de; Pênasin bî mafê neteweyê Kurd di otonomiyekê de kîr, ku piştî salekê bîbe azadiyeke dîrust bî gîhandîna hemû besên Kurdistanê bo dewleteke Kurdi û başûrê Kurdistanê ji tevde. Lî ew hêvi, di Peymana Lozanê ya 23'ê Tirmeha 1923'an de hatin perçiqandin. Piştîre wilayeta Mûsil di 16'ê Kanûna Pêsi ya 1925'an de, jî Iraqê re hat pejîrandin. Lî ser hîndê ew komiteya ku jî aliyê Koma Neteweyan ve hatîbû damezrandin, di rûpela 57 ya raporta xwe de nuvisibû, ku Kurd ji xelkên herêmê jî 1/5 e û ev rasti diyar dîke ku dewleteke Kurd a azad bête damezrandin. Lî belê Koma Neteweyan bî tenê diyar kîr, ku Kurd

mafê xwe di mesela rêvebiri, beram-beri û di dezgehêñ zîmani de heye.

Lî ser şoreşa neteweyi li başûrê Kurdistanê di bîn serokatiya Şêx Mehmûdê nemîr de û pênasina wi wek hukumdareki jî ali hukumeta Bîritani di 1919'an de bo cara yekê, û 1922'an de jî bo cara duduyan çêbû. Lî belê ev besa Kurdistanê bî zordari û li dij raya xelkê wê, dîgel dewleta Iraqê ya nûçebûyi hate girêdan. Hukumeta Bîritani hewl da ku dîlê mîletê Kurd hêsan bîke. Dema ku hukumeta Iraqê di bînê çavdêriya Bîritanya de bû, sozekê di beyana xwe ya resmi ya herdu aliyan de (Bîritanya-Iraq) da ku pênasina mafê Kurd ê ku di nav vi tixûbi de ye, hukumetekê damezrine. Hurdu hukumetan hêviya xwe diyar kîrin ku, Kurd hemû bigîhêñ tifaqekê li ser rengê wê hukumetê û tixûbêñ wê, nûnerêñ xwe bîşinîn Bexdadê bo guftgo li ser têkiliyêñ abori û siyasi dîgel Bîritanya û Iraqê bikin. Lî mixabin ew soz tenê wek reşbelekiyek mane li ser kaxez.

Di 3/10/1932'an de, çaxê Koma Neteweyan razi bû ku Iraqê wek endam bîpejurine, şerteki li ber dani, ku benda 16 ya ilana xwe, ku di 30'ê

Gulana 1932'an de derketibû, bî cih bine. Yek ji wan şertan ev bû: "Pêwist e ku Iraq rewşa mafêñ mirovati, rewşenbiri û rêvebiri yên Kurdan û yên eqeliyetên dîn li wilayeta Mûsîl, Hewlêr, Silêmani û Kerkükê biparêze.

Lî gor bîryara dawin a Koma Netewyan dî 18'ê Nisana 1946'an de, ew dokuman, beyannâme û peymanêñ ku dî nav Koma Netewyan de hatibûn wergirtin, hemû veguhêzin bî dezgeha Neteweyêñ Yekgirti. Îcar ew bend bî temami hene û nîha ji dibihurin.

Benda 16'an a vê ilanê diyar dîke, ku Iraq nîkare bî derxistina hin qanûnan guhartîn têxe van bendan, heta ku Koma Netewyan bî pîraniya denganê razi nebit. Û her nehevditîneke bo tefsirkirina bendêñ ilanê, wê li dadgeha dewleti ya berdewam bêtin çareserkirin.

Lewra azadiya Iraqê û yekitiya axa wê, girêdayî bicihanina bendêñ vê ilanê ye. Lê belê hukumeta Iraqê yên lî dû hev hatîne, bî awayeki eşkera li dijê wan bendan derketine. Ev hatîye eşkerakirin ku dî nav bîryara Civata Emîniya Dewletan de jimara 688'an dî 5/4 1991'ê de û dî bîryara jimara 71/1992 ya Komita Mafêñ Mirovan a Neteweyêñ Yekgirti (Civata Abori û Komaleyeti) de, dî 5'ê Adara 1992'an de destnişan bû.

Mêjûya gelê me yê Kurd lî Iraqê. bî serhîldan û şoreşan tije ye. Dî 11'ê Elûna 1961'ê de, vi gelî dî binê serokatiya serokê nemîr Mistefa Barzani de disa çekêñ xwe hilgirt. Pişti ku hukumeta Evdîlkerim Qasim sozêñ xwe bî cih neani û pişta xwe ji Benda Sisiyan a Qanûna Berwext zivîrand, ya pişti 14 yê Şoreşa Tirmeha 1958'an de ku dirust bûbû, ku Ereb û Kurd dî welêt de bî ortaxi hatibûne hesabkirin. Ew şoreş, şoreşeka neteweyi bû ku daxwaz û hêviyêñ miletê me yên rewa dianine pêş.

Ew tîfaqa 11'ê Adara 1970 û bîryardana bo mafêñ otomomi ji neteweyê Kurd re û çespandina dî qanûna hukumeta Iraqê de, herçend hukume-

ta Iraqê bî temami ew bend bî cih neanîn ji, disa ew berê fêkiyêñ wê daxwaza miletê Kurd bû.

Û li ser şikestina 1975'an de ya pişti wê plana dewleti ku bûbû egera imzekirina Tîfaqa Cezayirê ya ku Seddam Huseyn perçeyek axa Iraqê firot Iranê da şoreşa Kurd bpirciqine. Miletê me yê Kurd bî zûtûn dem rabû ser nîgan û li şoreşê berdewam kîr, da ku bo hemû cihanê diyar bike, ev neteweyek e ku tu cari nakeve.

"Misaq'a Neteweyêñ Yekgirti diyar kiriye: "nabe ku mirov ji mafêñ bin gehin ên mirovatiyê bêtin bêparkirin. Û her neteweyek çi bicûk û çi mezin, bê cudati mafêñ xwe werbigrin."

Xala şesan a beşa yekê diyar dîke: "Têkiliyêñ xweş dî mabeyna neteweyan de li ser bîngehek rêzgirtin bo bir, bawer û yekitiya mafan dî navbera miletan de ku her yek heq hebe bîryarê li ser pêşeroja xwe bîde." Û ev ji li serê girani hatîye danin, dî doza dewleti ya taybeti de ku ji Komela Gîsti ya Neteweyê Yekgirti ya 1966'an de derçüyi û ku Iraq dî 1971'ê de bûye endamê wê, diyar dîke: Lî ser "mafêñ hemû miletan dî bîryardana bo pêşeroja xwe û bîryardana bî azadi bo hebûna xwe yê siyasi."

Lê eger em li rîbeza hukumetêñ Iraqê, ji destpêka damezrandina dewleta wê ji 1921 heta niha, li ser rewşa miletê Kurd binêrin, em dibinin ku zordari, derdeseri û bêparhistin bûne nişanên vê rîbaziyê. Ev ji bî awayen rîkûpêk lê dijwartır hatîne. Hukumeta Iraqê karêñ xwe yên dirundayeti firehtir kîr, li miletê me êrişke pîr mezin kîr ku mirovatiyê dî dîrêjahiya mêjûya xwe de tişteki wisan neditiye. Weki:

1- Girtina heşt hezar bêgunehêñ Barzaniyan dî şeveke tari ya 1983'an de, ku heta niha ji rewşa wan eşkera nebûye.

2- Bîdûrxistina bêtir ji 300 hezar Kurdên Feyli bo derveyê Iraqê, dî navbera salêñ 1970-88, û girtina bêtir 7500 ciwanan û windakirina wan.

3- Vebîrandina bêtir 5000 jîn, zarok û

kalên bêguneh bî çekêن kimyewi û gazên jehri li bajarê Helepçeya şehid, dî roja 16'ê Adara 1988'an de. Û hindê jimarêñ din li Balisan, herêmêñ din ên Kurdistanê.

4- Êrişike pîr xwinavi ji hemû rekoran di zulmê, dirundayeti û bêmirrovayetiyê da bihuriye. Ew ji bî navê "El Enfal" çêbûye. Bêtir ji 180 hezar bêgunehêñ Kurd bûne qurbana işkence, bîrsihîstün, xesb û binaxkirina zîndiyân.

5- Wêrankirina bêtur ji 4500 gundan, ku ew dibin ji %90'ê gundayetiya Kurdistanê.

Herweha lawêñ eqeliyetên din ên Kurdistanê ji, ji dirundayetiya hukumeta Iraqê bêpar neman. Pişti wê serhildana mezin di bihara 1991'ê de, hukumetêñ dînyayê yêñ ku demeke dîrêj bêdeng mabûn û herdem ji li wan dirundayetîyan dînêrin, lê dema ku miletêñ wan trajediya müşextbûna tevayı, ku rekoreke dînyayı bû dî camêñ televizyonan de dîditin, ev car nîkaribûn qêrina xwe bîbirin û ruhnikêñ wan zuwa bikin.

Ha wisan pişti Peymana SEWR'ê, ev cara yekemin bû ku cihanê bî peyveke rast di layêt Kurdan de cara duduyan got, dema ku bîryara jîmara §88 ya Cîvata Eminahiyê bî eşkera, gunehbariya qelandina Kurdan kir û piştre ji herêmeke êmin ji beşeke Kurdistanâ Iraqê damezrand. Herweha soz da Kurdan ku dê wan ji êrişen rejima Iraqê ji bîparêze.

Miletê me herdem li ser hemû zordariyan niyeta xwe ya paqîj, li hemberi her insiyatigeke bo çareserkirina vê gîrifstariyê diyar dîkîr. Ji wan insiyatigan guftûguyêñ 1984 û çendin pêngavêñ din bo çareserkirineke aştiyane digel rejimê. Lî belê dîlpakiya miletê me, hertim bî xedr û xiyanet û bêsozi dîhate bersivdan. Duwatîrin tecrûba me di 1991ê de çêbû, dema ku rejima Iraqê pişta xwe da sozêñ xwe yêñ ku di destpêka guftûgoyan de dabûn şoreşa Kurd. Piştre hukumetê rêvebiriyyêñ xwe yêñ miri ji Kurdistanê vekişand û ambar-

goyeke abori li ser dani. Ew kîryar, miletê me naçar hîst ku bî awayekî rengin di 17'ê Gulana 1992'an de hilbijartînêñ azad bikin. Dumahikê miletê me di herêmêñ azad de nûnerêñ xwe bo Encumena Niştimani ya Kurdistanê hilbijartîn. Û yekemin hukumet di 5'ê Tîrmeha 1992'an de bo herêma Kurdistanê hat damezrandim, da wê valahiya heyi mist bîke.

Qanûna Encumena Niştimani ya Kurdistanâ Iraqê ya jîmara 1, xala duduyan ji benda 56 dibêje: "Îşê encumenê, karûbarêñ pêşeroja miletê Kurd ê Kurdistanâ Iraqê ye. Û diyarkirina têkiliya qanûni digel karbidestiya merkezi û parastina yekitiya niştimani li Iraqê, pêwendiyêñ birayeti yêñ mîjûyi di mabeyna Kurd û Ereb de. Û bî pitewkirina van pêwendiyân û rîkkeftin digel bîryara opozisyonâ Iraqê li Wiyana û ya li Kurdistanâ Iraqê ku girani rane bir û bawerêñ bîryardana miletê Kurd bî mafê xwe di pêşerojê de bî awayekî rîkkefti digel berjewendiyêñ di nav miletê bîra de. Û mafêñ neteweyi, rewşenbiri û rêvebiri yêñ Turkman û Aşûriyan û misogerkirina yekbûna wan di maf û xwebestinan de.

Ha wisan Encumena Niştimani ya Kurdistanâ Iraqê iro li pêş miletê Kurdistanâ Iraqê ve karê xxwe dibînit û mafê xwe yêñ li dû peyman û misakêñ dewleti ku me ew nişan kîrin bîryardanêñ bo pêşerojên bî kar tîne. Û eşkera dike ku bî piraniya dîgan bîryar li ser pêşeroj û têkiliyêñ xwe yêñ qanûni digel karbidestiya merkezi di vê qonaxa mîjûyi de li ser bînyata Yekitiya Federali di nav Iraqueke demokrat a parlementi de baweriye bî sistema pirane rîxistin tîne. Û rîza mafêñ mirovayeti yêñ pînasina li gor peyman û misaqêñ dewleti pê hatîne kîrin digire.

## Encumena Niştimani ya Kurdistanâ Iraqê

Hewlîr, 4/Cîriya Pêşin/1992



## HEVPEYVİN

# B1 Seydayê Keleş ra

જ Kek Seyda, ji kerema xwe ra tu dikari ji xwendevanên Roja Nû râ hineki behsa jiyana xwe biki?

જ Belê ez dî sala 1930 da, li Kurdistanâ Bakûr, li herêma Mêrdinê û li devera Omeriyan li gundê Bîzgûrê hatime jiyânê, bî navê Huseynê kurê Mîhemedê Huseyn-Keleş.. Û navê diya mîn Helima bîrahimê Melê ye. Ez dîbîm zayinê wan yê yekê. Lê halê wan yê abori nebaş bû. Pişti temenê mîn gihiştîye pênc salan, bavê mîn çûye ser heqîya xwe. Pişti salekê diya mîn ji li wi bûye mîvan. Ez û xwişka xwe û biraki mîn em mane sêwi. Li ber diwaran, bê dê û bê bav û bê xwedî bê xwedan, zikek têr yek birçi.. Ev e destpêka jiyana mîn ya dûre-dirêj û dijwar. Pişti pîr tengasiyan temenê mîn dîbin deh sal.

Tê bira mîn ku mîn berê xwe da Suriyê bo ku bîxwinim. Ez hatim li herêma Amûdê gundê Xelil cem seydayê Mele Ebdulrezaq. Mîn li wir dest bi

xwendîna olperesti kir û ketim rîza feqîyan. Mîn çend saleki xwend, lê paşê jê geriyam. Mîn xwendîna olperesti nebîr seri ji ber ku mîn fam kir ku ev kar bê fêde ye. Ez nêziki komunistan û Seydayê Cegerxwin bûbûm û ketibûm nav partiya wan. Lê paşê ji wan ji vege riyan, ji ber ku armanca mîn dî nav wan de pêk nehat. Armanca mîn, pêkhatîna gelê mîn bû. Lewma paşê ez û seydayê Cegerxwin û çend hevalên din ketin nav Partiya Azadi ya Gelê Kurd li Suriyê.

Dî wê demê de kete bira mîn ku bîbîm malxowê malê. Mîn berê xwe da Tîrkiyê ku herim xwişka xwe binim û ji xwe re bikim berdêli. Û mîn wilo kir. Hîngê mîn bî xurtî karêni siyasi dane ser mlê xwe û bêwes-tan xebitîm. Dî sala 1956'an de partiya me demokrati û Pêşverû hat damezrandin. Ez û Seydayê Cegerxwin em ji nav partiya Azadi derketin û ketin nav Partiya Pêşverû û em man tê de ta roja iro.

□ Seydayê Keleş, xwendevanên me dixwazin ji te bibihisin gelo te kengê dest bi xwendin û nivisandina Kurdi kiriye?

□□ Dema ku min xwendina xwe ya olperesti dikir, di nav de ji min berhemên Ehmedê Xani, Melayê Ciziri û Seydayê Cegerxwin ji dixwendin. Wê demê ango di salen 1945 û 46'an de min xwe hini xwendin û nivisandina zimanê Kurdi kiriye. Lê ji ber ku diravên min nebûn ez kaxezan bikirim, min li ser qalikên pakêtan dinivisand. Ta niha ji têde ne serbest im, ji ber ku nivisandina min wek ya Cegerxwin bi tipêñ erebi ne, paşê werdigerinim tipêñ latini.

□ Te kengê dest pê kir rist û helbest nivisand?

□□ Belê, piştî ku hini xwendin û nivisandina kurdi bûm, min berhemên Ehmedê Xani, Melayê Ciziri û Seydayê Cegerxwin bi dest xistim û vina wan kete dilê min. Ez nêziki Cegerxwin bûm, di sala 1955'an de min dest pê kir bi Kurdi rist nivisandin. Min geleki dixwest ez bûbim ristevan. Min desterek tiji rist kir û paşê raberi Cegerxwin kir. Rahışt deftera min û lê nêri û got: "Seyda nivisandina te wek lepêñ mirişkan e, ez nikarim bixwînim. Tu ji min re bixwine ez li te gudari bikim". Min jê re xwend û wi gudari kir û got: "Seyda, ev ne hêjayî çapkîrinê ne, lê ez ê ji te re bêjim tê çawa rista bidi avakîrin." Wi digot ku, divê rist li cem ristevanan bêñ xwendin û hinék ji ristên rêk û pêk ji min re dixwend û şiret li min kirin. Li ser ava kîrîna ristan ez wê şevê ranezam. Li gora gotina wi min wê şevê ristek amade kir û disa min jê re xwend. Serê xwe hejand û got: "Ev rista te meriv dîkare bêje baş e. Bi vi reng û awayi tê karibi bîbi ristevaneki baş." Disa ji hin kêmasi ji min re gotin û min dest pê kir bi xurti. Salek derbas nebû min disa deftera xwe jê re ani û jê xwend û wi ji min ra

"aferim ji te ra," got, "hin ji wan pir xweş in, lê hin ji wan kêmasiyê xwe hene. De ka çend rojan li cem minbihêle da ku jê re pêşgotina wê çê bikim." Piştî vê yekê dilê min xweş bû û pir lê şidiyam.

□ Seyda diwanek te di nav Weşanên Roja Nû da hatiye çapkîrin. Gelo ji bili wê ci berhemên te yêñ din hene?

□□ Belê, tevi ku demek dûr û dirêj di ser berhemên min re derbas bûne (nêziki 40 sali), berhemên min nehatine çapkîrin. Heşt (8) diwanen min ên ristan hene. Du çirok, yek bi navê "Berkê", ya din bi navê "Hûto, Hemişe, Boxê Bîriva" hene û komek metelok ji (500 metelok) heye û ferhengek Kurdi, ji 1000 (hezar) gotini pêk tê heye û hinek kurteçirok ji hene. Lê belê tiştek ji van nehatiye çapkîrin, ji ber ku ne ez karim û ne keseki alikariya min kiriye. Ji bil diwanâ yekê. Ez bê xwedi me nuha, lê hêviya min xurt e, ku wê demek bê milletê min wê ali min bike. Ez heta nuha ji di vê baweriyê da me.

□ Seyda, gelo ki yan ji ci li te tesir kir ku tu di nava xebata welatparêzi da cih bigri?

□□ Belê di seri de ew bû ku min berhemên Ehmedê Xanê û Mele Ehmedê Ciziri û seydayê mezîn Cegerxwin ditin û him ji ketûme nava sê partiyêñ insani û geleri. Min hinek xwendina olperesti ji xwend û ketûm nav karkeran. Min dit ku ci zilm û teda li wan tê û ew çawa dixebeitin û barê wan çiqas girane û vê cihanê didin avakîrin û xwedîyê wan ji tune. Wijdanê min nema hilgirt ku ez nebêjim û nenivisim. Ev bûn sedem û sebebêñ ku hîştin ez têkevîm vi wari û vi xebatê û hin weris li ser çirikê ye.

□ Em welê dizanin ku tu nuha derşen zimanê Kurdi did. Gelo çend şagirtên te hene?

□□ Belê. Jî dema ku ez hini xwendin û nivisandina Kurdi bûme heta iro, mîn gelek keç û xort hin kirine. Lê bêtur keç. Nayê zanin û hejmartin, jî ber ku gelek sal çêbûne. Nêziki 40 sali ye, ku her sal mîn ders dane. Lê belê yên ku nuha dî destêن mîn da hene, dixebitin û dixwinin dora 30 kesi ne. Gîşt ji keçik in.

□ Gelo çuma di hinkirina xwendin û nivisandina zimanê Kurdi da, sagurtên te gîşt jin in?

□□ Jî ber ku jin, him û esasê milletan in û yê malan in. Dema ku jin xwendevan be, wê zarokên xwe tevan hini xwendinê bike, jî ber ku herdem ew bî wan re ye. Keç û jin bêtur dîkarin alikariya mindalan bikin, wan hin bikin. Xort nîkare bî qasi keçê bî vi kari ve rabe.

□ Dî şerê jiyan û rizgariyê da jin ci-heke taybeti digre. Derbari vi babeti da ditinêن te ci ne?

□□ Belê. Herkes dizane ku tu millet yan tu gel bêyi jinê ne aza bûye, ne ji hatiye jiyanê. Tu şoresh bêyi jinê çê nebûne. Ez dîkarim bêjim ku desteki jinê yê dirêjtir û stûrtir heye dî azadiya milletan de. Jî ber ku jin û mîr wek goşt û nenûkê ne, jî hev nabin û bêyi hev ji nabın. Çumki jin rîknê malê ye, jiyana bê jin pûç e. Disa dîkarim bêjim, wek meteloka kurdi gotiye Şêr şêr e, ci jin e û ci mîr e. Çawa ku Cegerxwin ji digot, jîna ne xweşik tuneye, jin hemi xweşik in û bedew in.

□ Seyda, weki em dibinin iro xasîma di Kurdistanâ besûr da bayê azadiyê xurttir bûye. Kürdên wi parçeyi Parlamento, hukumet û hîn saziyên neteweyi saz kirine û jî bo awakirina welat dixebitin. Gelo nêri-nêن te di vi wari da ci ne?

□□ Ez geleki kêfxweş im bî vi bayi. û hêvidar im ku ev ba xurttir bîbe, ne tenê li Kurdistanâ başûr, li hemû

perçeyen din ji. Lê belê dibinim ku ev ba ne tenê dî destê xelkên vê devera Rojhîlata Navin de ye, dibinim dî destê xelkên Ewrûpa û Emerika de ye. Wîsa ji lî gora xwe, kara xwe didin meşandîn. Eger dî xurtiya me de kara wan hebi, wê me xurt bikin. Eger kara wan dî xurtiya me de nebi, wê me nedîn pêş. Lê belê hînek jê, yani ji xurtiya me, dî destê me de ji heye. Jî me ji tê xwestin ku em birewer bin û diplomasiyê zanibin, kar û xîsara xwe zanibin û em lî ser hev bin, lî diji hev kar nekin û nexebitin, û pişta hev bernedîn û hevdu nekujin, û partiyêne me bî rîk û pêk bin. Wê demê em ê bikaribin lî ber xwe bîdin û herin seri.

□ Li gor baweriya te kurdên parçeyen din dîkarin bî ci awayi alikariya Kurdistanâ başûr bikin û ci ji wan tê xwestin?

□□ Jî me tevan tê xwestin ku em hemi imkanen xwe pêşkêsi wan bikin û tişteki ji bo wan nedîn paş. Divê em piştgiriya wan bernedîn û her û her li ali wan bisekinin. Lê belê em xwe ji ji bir nekin ku em ne Kürdên Kurdistanâ Iraqi ne û daxwazên me û wan ne weki hev in. Şert û hoyen me ji hev cuda ne.

□ Siret û pêşniyarên te ji bo xwendevanen Kurd ci ne?

□□ Jî xwendevanan û ji xortan dixwazim ku bî hevre bin û ji hevdu hez bikin. Bîla bî zimanê xwe bixwinin û binivisin. Jî gelê xwe re, ji hemi niviskar û xwendevanan re, ji gelên bindest re, ji hemi kesen nexwes û tengezar re xweşi, azadi û serxwe-bûnê dixwazim.

Ev hevpeyvin bî S. KELES ra, di Tebâxa 1992 da ji ali heval B. DERSİM hatiye kirin.

# MEM Û ZİN

Wek Radyo-dramatik - 3

(Jî ber variyanteki folklorik hatiye girtin)

Radyo-dramatizekîrin: Robert ALFTON

## ROLÊN DRAMATÊ:

MEM: Zirkurê Alan Paşa  
ZİN: Dota Mir Seydin  
QISEDAR (yê mîr): QM  
QISEDAR (jin): QJ  
HESP  
QERETAJDÎN  
ERFAN  
ÇEKAN (Çeko)  
BEKIR (Beko)  
DOTA BEKO

### SEYDÎN

Belê, ez ji ji ber rabûm, lê bêyi hemdê xwe.  
QJ

Zinê bîhistibû ku mîvaneki pir eziz hatiye. Dî  
ber perdê ra mîzekir û dit ku mîvan Memê ye.  
Belê Memê bî xwe ye! Lî wir rûniştiye. Zinê  
rabû çû ser banê xani û dest bî stranê kîr:

### ZİN

Geli stêrkên ezmana  
Îro cîvateke mezin lî hev kombûye  
lî mala bavê mîn

### MEM

(Difikire) Ev dengê xweş, hebe tunebe dengê  
Zinê ye!

### QERETAJDÎN

(Difikire) Zinê strana davêje ser mîn û xwe.

### ERFAN

(Difikire) Dengê destgirtiya birayê mîn, geleki  
xweş e.

### ZİN

Lî wêderê hûn dibinin Qeretajdin e  
Yê dîn Erfan e, lî tenîsta wi Çekan e.

### MEM

(Difikire) Dî dawiyê da mîn Zin'a xwe dit!

### ZİN

Va ne, Qeretajdin, Erfan û Çekan e  
Lê, lî ber dîlê mîn geleki eziz e, ew kesê çaran  
e  
Çimki ew delalê dîlê mîn û we Memê ye

### MEM

(Difikire) Dîbe ku ew mîn bikujin ji, lê ez ê ji  
bo Zinê stranekê bêjim:  
(distire) Hey bûrano mîzekin

Bînêrin ka lî ser banê xaniyan  
Lî jêra sûrê, lî eywanan  
Ez sond dixwîm ku mîn bîhist  
Dengek tê ji van dorhêlan  
Gelo ew periyek bû yan hûriyek  
Distura ji bo mîn?

## ERFAN

Ez rabim ez ê te bukujim Memê!

## ÇEKAN

Ya ku te dil dayê, destgirtiya kekê me ye, Zinê ye.

## ERFAN û ÇEKAN

Bı xwina xwe tê vê rûreşiyê baqış biki!

## QERETAJDİN

Brano, bisekinin! Jê vegeerin, ma hûn çawa bawer dikin ku ji van gotinênu ku Mem û Zinê ji hevra gotin tiştek derdikeve. Ev gotinênu vala, xem û xeyal in. Guh medinê.

## MEM

De bila qedera min nişan bide ka ev xewn tenê xewn e.

Bila qedera min xwiya bike ka evina min û Zinê rast e, yan derew e.

## QM

Ü Zinê, sê deve bi qumaş û pirti da barkırın. Paşê rabû cariyên xwe da pey xwe û karvanê xwe bire ser kaniya ber mala Qeretajdin

## MEM

(Difikire) Eger ev min li vêderê bikujin ji, ez ê li ser zinê bazırgani wê stranekê bêjim.

(distire) Geli birano hat bazırganê giran e

Serê min xulama vê imama-karibar e  
Bihayê wê strana ser dran û lêvan e  
Hêjayi Memê Alan e  
Mirov jê bistine bac û bertilan e

## ERFAN

Ez şûrê xwe bikişinim te bikim hezar parça

## ÇEKAN

Va ye şûrê min ê bîriqi, ji bo şeref û namûsa me, gerek ew bê kuştin.

## QERETAJDİN

Birano gudari bikin! Ez sond dixwim bı wi yê ku ruhb me bı destan e: Qısa Mem û Zinê xeyal e, xewna şevan e. Ez ê jê ra bêbijim ku

Zinê bûka min e.

## MEM

(Difikire) Zinê bi bazırganva hate ser kaniyê. Ki bikaribe ji wê bac û bertilê bistineb ew ya wi ye.

## QERETAJDİN

Memê, ew xatûna ku tu li ser stranan dibêji, ew bûka min e, destgirtiya Çekan e. Hespê xwe bajo here ser kaniyê. Eger te jê bac û bertil stand, tu bizanibe ku tu birayê me yê mezin i û em ji birayêne te yên piçûk. Na eger nikaribi jê bac û bertilê bistini, êdi cihê te li van deran, dî nav me da namine. Careke din ji em te li vir nebinin, em ê wîsa bikin ku parçê te yê mezin tenê guhê te bimine.

## QM

Memê rabû hespê xwe kişand, zin lê kır sıwar bû û ajote ser kaniyê.

## HESP

Ey Memê, vê carê zor û xeter e gera me  
Emê nuha xwe bigihin wêderê  
Dema ez devê xwe bikim kaniyê  
Hingê Zinê wê gustilka tiliya te bibine  
Tu wê sê bertilan jê bistini

(Memê hespê xwe dajo ser kaniyê)

## MEM

Va ye ez hatim.

## ZIN

Tu bı xêr û xweşi hati

## MEM

Me li malê bîryareke mezin gitte. Min hêvi û gumana xwe spartiyê te, lê ez dûrsim ku tu bı ya min neki..

## ZIN

Memê aqlî xwe li serê xwe komke. Devê hespê ji avê dermexine, bila bi hemdê xwe vexwe. Ez ne ew jin im ku bı te ra bêbextiyê bikim. Ma tu nabini gustilka te dî tiliya min da ye.

*Dumahik heye*

- Ez û ez ne tu kes.
- Bî vê qûşê em narın Mûşê.
- Papaxê serê te çi rind e, bejna te ji bîlind e.
- Xêr be, berê ewîl nêr be.
- Gotinê xelkê paç in, dî guhê mîn naçin.
- Nan bixwe pari pari, şorbe bixwe heta tu dikari.
- Xewa kuştıya tê, ya birçiya nayê.
- Xwediyê miriya kor e.
- Silav lî sifra hazır e.
- Doz lî nîk şûr û pera.
- Mîri dîmre ji nû ve şérin dîbe.
- Dûr i, bî nûr i.
- Şam şeker e, welat şêrintir e.
- Ronahi lî pey tariyê ye.
- Madem heme ez, divê hebim ez.
- Bavê Medê çûbû kedê, taştê ani şiv lî Xwedê.
- Nên bixwin bî qinyat, jîna bixwazin lî şûna bî kok û bî binyat.
- Berxê çê lî ber kozê.
- Kîrivati bî herdu seriya.
- Xelkê sor û zer e, ê me lî dînyê der e.
- Jî me keto bî me keto.
- Dîza jî dîza dîzi, erd û esman lerizi.
- Lingêner kera neyê ser berra.
- Hînek dîkun, hînek dîxwin.
- Ne Adar e ne Nisan e, roj roja Feqiyê Teyran e.
- Seriki kara, bî çardeh mala
- Hat binya mala, ket pêsiya hevala.
- Nanê Tîrka lî ser kaba wan e.
- Ap û bîrazi jî mîrga re, xal û xwarzi jî şera re.
- Jî ava xure xur netirse, jî ava bêdeng bitirse.
- Sêvâ sor, dikeve destê kundê kor.
- Mîn bûkek ani bî lez û bez, sıvika malê disa ez.
- Heft mîrê beriyê, hatine barê hîriyê.
- Hûr e, felqa şûr e.
- Kînik im jî mala re, dîrêjim jî şala re.
- Xwezi bî navê mîra, ne ku bî ditina mîra.
- Diwaro jî te re dîbêjim, bûkê tu fêm bike.
- Zîk têr e, xew jê re xêr e.
- Ha seri lî kevir, ha kevir lî seri.
- Bî ılmê mîn bike, bî emelê mîn neke.
- Nan jî çolê, av jî golê.
- Yê ne lî malîkê, nîzane bî hewalikê.



# Ji zargotina me

(Dengbêjê van beytên jêrin, Mam Heme Canmarf e. Ew bixwe ji dora Mehabadê ye. Li gor danasina Ehmed Serifi, Mam Heme gelek beyt û kilamên kevn û diroki zaribûye. Heta beyta "Dundim" ji gelek baş zaribûye. Ew di sala 1987'an da çûye heqîya xwe. Lê ji ber devê wi gelek kaset hatine wergirtin, ku ev herdu beytên jêrin ji, ji ali Ehmed Serifi hatine wergirtin û ji Roja Nû ra hatine şandin.)

## SUWARO

Berevkar: **Ehmed Serifi**

Ewro kij delê:

Hey suwaro, ewroke dengit nayê  
Ewe emin natbinim le wey çolani,  
le berian ú le sehrayıye  
Ewro suwar debû bî seferêki gewre û girani  
tepe ú kawlelehseyiye  
Dawayi du maçı dekirdi be seri betal,  
Emin ewe rûm werdegêre, nemdediye  
Hey ro suwaro, emaneti le to bê  
le wê seferi gewre ú gran,  
Hesen ú husén le deşti Kerbalaye.  
Suwaro, ewroka eger be xér ú selamet  
beyewe le wê seferê,  
Emin singi xomit bo dekemewe degirmen û degirmesêri,  
be baxi desefayiye.  
Hey suwaro, rebil.. be dûr bi le şerê hewelê,  
na welle le şeri espi de ecelê, le bîrini qerebinayiye.  
Ewro eger be xér bê were suwar bewe  
eto hazani le ber qırçey derûnim,  
ewe masi nehenge serîyan derdênin  
le gomi Leyl ú peri, le şideti degirmayıye.  
Eger beyewe le wê seferê,  
emin singi xomit bo dekemewe be germên û germesêri,  
be baxi desefayiye.  
Be hucrekey xase ref ú melayiki duwanzde ilm  
le wê da bekewe mubtelaye,  
Hey suwaro, were suwaroyi le min be tenê.

Ewro kij delê:

Suwarokey birindare bî rimbê,  
derwanim debinim be bîrini xencerê to xwudakey,  
bileyn be hekim ú be etarewei!  
Eger zeferi péneben ci taqan desti nagenê.  
Xom dermaneki bo degirmewe le darçinê,  
le qenefilê le jengê deguwarey be desti be desnuwêj  
be bismilayi degirmewe be areqi kulmi ber gerdenê.  
Deyhawênewe serbîrini suwarê nebada  
le roji tengi da li mini malwêran bênetewe teşenê!  
Ewrokanê le min mezni,  
ew qelayê gewre ú granî eto deçiyawe bini  
ber rimbî xezalé qesi ser le polaye  
we ser le asini defbiriyewe kepo ú lüti êli begi Dasini.  
Delen hey suwaro, ewroke Wanli leşkirêki bo suwarekey min çêkîrawe  
gelêke leşkirêki zorbey zor e ú bê hesanewe le wê da êmdaye.  
Emin debinim dûseti Sûrciyîye ú Zorari ú Kurebebeyiye,  
Heliyan dedanewe le deştê, le kawileki piremerheyiye.  
Hey suwaro, ewroke deyanbinim dûseti Rûsi,  
sêseti İngilizi ewi dikey Kurebebeye,  
Hoy suwaro, le min be tenê!..

# LEŞKIRİ

Dad û bêdad, serêki min dêsi, dilê min çendi le Jane Jane  
Xo emin de bo to delêm be diwani Xani,  
roj ki le burcê minewer dehate derê û şewq û şebeqi deda le koşkan,  
le penceran, le derwazey heftset be kewane.  
Xo emin de bo to delêm be diwani Xani, ke lê irade xir û  
serendaz û mafürey her le wê da Xorasane.  
Emin bot hêlakim be diwani Xani  
Dad û hey bêdad lêy dedin de pêncsed kursi û sendeli û  
pêplikan û de nêrdiwane.  
Le ser ewanim dadeniştin çend mir û begler û xane,  
Xan daweyi milki Tûraniya dekirdewe deyanda ferman be fermane.  
Xo emin le bot helidekêm be diwani Xani,  
ke lêy dadeniştin çend mir û begler û xane û xan,  
Le layeki qawe û dexurawé, le lay dikemewe dekêşrawe qiliyané.  
Le layeki daniştibûn kure kurey de mefiredi û genci marpêç le sêsed û pêncâ timeni le sar lêwane.  
Xo emin le bot helidekêm ku paşxaney xaniqûléki begiya,  
ke lêy radewestan pêncsed nokeri erbabi Şame,  
demançey nêriyan le ser kêlekane.  
Duwazde mecrûmey dehatewe diwani Xani (24)  
zêrf le seran deden ranre, nan dexûra, nimet be zêde dekira,  
aftawe le jini zér hazîr debû dest û dem deşûrane.  
Xo emin le bot pê helidekêm be telari de xaniman, ke lêy dehatime derê.  
Xanım û xatûni modeyan karebane,  
Tütinîyan semsûne, polûyan qırxaqlane.  
Xo emin bot helidekêm be méri, medam raweste le kari hesarê û  
xırxali zér belek dehatine xwarê bo ser geri depayinane.  
Go bedene kawley bangî dekerd,  
Girewi Xan Sulêyman Begi Xani ú le berwey daderini  
tokûtelism ú dur ú le êhk ú mercane.  
Deynewe de destkêka gulê batini ú deygot le bo axa û xotiyân,  
ber ewe be resmi yadigar ú her be nişane.  
Xan de demê da weazi rawî heldesta bang deka leşkiri,  
leşkiri we cuwaberane.  
Hero tewile û yextermexanê û derkêşe ciwanemayneki qapresi yal û pij  
be jengari damén teri kılık le ser çuwane  
ta weko suwar bin biperinewe le ziye mezin bo  
nêw qewm û xîsekê xoman be ci kone Dasiniyane.  
Xan suwar debû de periyewe le ziyê mezin heliyan destand  
şînkê matê melûlê, destkurtê, paşûbilindê le ber helat helatê,  
de suwaran le ber cephe rîzani Kurebebeyan le ber wirşey depalan.  
Le ber pirmey kehêlan, le ber niskey de tacî û tüley xeliliyan,  
xoyi de min deşardewe, xoyi daniştewe rewezi de berdane.  
Xantepi mayinê serûdûn axayı dedan û  
her çuwar peli mati melûl û deygirt û heli dekêşa  
qelembazêki deskmahi û keleyi seri debirdewe bane.  
Bang delê leşkîr, hey leşkire giyane  
Bo axayı xatibere be yadigar ú dewameti her be nişane.  
Xo emin bot helidekêm be Ayşê Rabî û dewi dêwelane, deygot:  
Werm konêki heldirin her le wê de siyamalane.  
De beri babi Xan Sulêyman Begi keyn,  
ew axayı diman naybininewe heta ewê rojê ebedi le ebediyane.  
Xan bang deka leşkire, leşkire giyane.  
Eger axayı xot mird, tabûti axayı xot helikene le nêwan  
sing û memikan le bin kiraseki melhemdarî ketane.  
Le serini axayı xot derêne toq û telism û dur û leyîl û mercane.  
Le pêy axayı xot derine reste û queretey ewan tacî û tüleyane  
Xan le çawediwxani de be lhê Romiyan  
be piyalêki jehr û be yek jehri mar  
deyan kirdewe şeket û şelal û begiyane.  
Ewe Xan Sulêyman Beg denalêne le ber êşê cerg û desiyane,  
Leşkiriyan denalênê le ber êşê debirinane.

# Rexnegiri yan çavnebari?

Dî hemû edebiyatê niviski yên pêşketi da rexnegiri, bî serê xwe wek beşeki giring û pêwist tê qebûl kîrîn. Lî mixabin ku hina lî ba me rexne û rexnegiri bî awaki zanisti û pozitif bî cih nebûye.

Bî taybeti dî kurmanciya jorê da kesên ku rexneyê edebî dîkin geleki kêm in. Dî nav yên heyi da ji, hin kes hene ku ne ji bo xîzmeta zîman û çandê, lê ji ber zikreşî û çavnebaryâ xwe vi kari dîkin. Dîlê wan ji kê ra û çawa bixwaze wîsa "rexne" dîkin. Helbet rexneya durust û kîrhatî karê herkesi nine, herkes nîkare bike. Kesê ku vi kari bike gerek bêali, objektîv û zana be. Ü beri hertiştî dîvê xwe ji zikreşî, hesûdi û çavnebaryê paqîş bike û qet nebe hineki ji li wijdana xwe guhdari bike. Eger ne wîsa be, ew kes wê ji qenciyê bêtir xirabiyê bike.

Belê me got rexnegirê me bî hejmar kêm in, lê dî nav wan da yeki meşhûr heye ku bî tena serê xwe vê kîmasiyê berteref dîke (!). Ew bî imza Lawkê Berrivani, (û bî imza Zînarê Xamo) dî rojnama Armancê da dinivise. Carna bî xwe "dîziyê" dîke, carna ji "dîzan" digre. Lî disan ji "rexnegir" e. Gerçi ji rexnegiriyê bêtur essas karê wi dedektifi û bekçiti ye, lê wi kari ji bî durusti nikare bimeşine. Xwezi bikaribûya...

Rojekê ji cotkareki piremîr pirs dîkin: "Ma qet lawê te tunene, çîra alikariya te nakin?" Cotkar dibê: "Bî xwedê heft kurên mîn hene. Tenê yên heri piçûk hineki baş e, dixwaze alikariya mîn bike lê belengazo him kerr e, him ji kor e". Lawkê Berrivani ji dixwaze rexnevaniyê bike, lê him çavnebar û zikreş e him ji usûla rexneyê nizane.

Ew dî rojnama Armancê (Hejmar 129, Heziran-Tirmeh 1992) da bî navê "rexnegiriyê" dixwaze mîn ji diz derxine. Dî nivisa xwe ya bî navê "Hewcedariya mîn bî çend dedektifan heye" da (pişti ku tehlila dîzityê û dizan dîke,

û normê ehlakê nişani xelkê dide!?) weha dibêje:

"Dî rojnama "Azadi" yê hejmara l'ê de li ser Mestûre Xanîmê niviseke bî imza Xalîd Lezgin heye. Lî bê guman nîvis ne ya wi ye, wi ji kovara Svensk-Kurdisk Journal bî awaki hosteyi dîziye; helbet qet qala çavkaniya nîvisa xwe ji nekiriye."

Diyar e L. Berrivani êdi dest pêkiriye bî hisû metodê Mikoyê bekçi dizan digre. Dibêjmîn Mikoyê bekçi wextê zivistanê sar, bî şev diçû dî firinekê da, li cihê germ radîza. Serê sibehê zû hisîyar dîbû, dûdûka xwe dixiste devê xwe çend caran difitand, hema li ber derê fîrimê ki biketa ber, bî milê wi digirt dîbire qereqolê. Lawkê Berrivani bî vi metodi dixwaze min ji wek diz nişan bide(!)

Nedîyarkırına çavkaniyê agahdariyan meriv dikare niqaş bike. Ev li gor nivisê ye; angô şeweyê nivisê çawa ye, ci ye, bî ci armancê û li kuderê tê weşandin. Beri her tiştî ew nivisa dî Azadiyê da, niviseke geleki kurt e, ji lêkolîneke akademik bêtir wek nûçeyekê hatiye amadekirin û aliyê wê yê informatik û propagandayê girantir e. Da ku qet nebe bî kurti xwendevan pê bîhesin ku dî filan wextê da bî filan navi jineke kurd hebûye, wê helbest û dirok nivisine, û dî filan wextê da li filan derê mîriye... Ango nivis ji agahdariyê fakta yên kurt pêk tê û dî rojnameyeke hefteyi da hatiye nivisandin. Ji niviseke weha ra şert nine meriv wek lêkolînen akademik çavkaniyan nişan bide. Rexnegirê me ji dizane ku dî rojnameyan da nimûneyê weha herdem hene û tişteki normal e.

Disan ew pê dizane ku nivisa E. Vasilievayê ya dî Svensk-Kurdisk Journal'ê da, lêkolîneke 9-10 qat ji vê nivisê dirêjtir e. Çawa rûyê L. Berrivani digre ku bêje ev dîziye? Wek delil, sê hevok ji nivisa swêdi û sê hevok ji ji nivisa kurdi daye (ku yek ji wan ji ciheki cuda quirkiriye anîye û li dû hev rîzkiriye, û yek ji bî kîmasi nivisiye) da ku xwendevan bibinin ku ev hevok çawa dışibine hevdu û X. Lezgin çawa dîzi kiriye... Te bilesebeb ewqas xwe êşandiye û bî hevokan leyistiye. Belê ew hevok dışibine hevdu, çimki dî wan da xusûsiyetekê Mestûre Xanîmê heye, him ji xusûsiyeta wê ya heri balkeş: Ku dî wê demê da li navcê jineke ronakkir mina Mestûrê, ku dirok û helbest nivisibe, tunebûye. Her kî behsa wê kiriye kêm-zêde eyni tişt gotiye. Mesela Yehya Marifat (lêger û

berhevkarê diwana Mestûrê) dî pêşgotina diwanê da weha nivisiye:

"Pêşdahatına helbestvaneke wusan wê demê da, ya ewqas mezin, ewqas bî jêhati, ewqas zana, dikare bê ditinê çawa ecêveke sırûştê" (Tosinê Reşit, Rûpelek ji Dirokê: Mestûre-Roja Nû, hej 5, 1984)

Zaneki farisa yê dema Mestûrê yê bî nav û deng, **Rıza Quli-Xan Hidayet**, Mestûrê weha bî nav dike "Jineke wê demê ya here bî nav û deng" (Bnr. çavkaniya li jor)

Prof. Şekroyê Xudo ji weha dibêje:

"dî qurna 19'a da, li temamiya Rohilata Nêzik û Navin, şair û dirok-zaneke meşhûr û jîn mina Mestûrê, (Max Şerefşanım Kurdistani) tunebûye." (Jî gotara wi ya seminera 13.11. 1988, li Stockholmê. Dî Roja Nû hej. 22'yan da ji hatiye weşandin.)

Yên ku beriya E. Vasiliyevayê û pişti wê li ser Mestûrê agahdari dane eyni tişt gotine û min ji wek wan gotiye. Belê Kurdên Sovyetê bî saya E. Vasiliyevayê û em ji li dervayı welat, bî saya wan bî hebûna Mestûrê hesiyan, ku hina qet Svensk-Kurdisk Journal derneketibû.

Ü her ki behsa Mestûrê bike wê eyni tiştan bêje. Gelo ku L. Berrivani bînvise wê vê xusûsiyeta Mestûrê neyne ziman? Gelo wê dî şûna qurna 19' a da bînvise qurna 21? Dî şûna Rohilata nêzik da wê bêje Afrika? Çi dektifeki jêhati yi tu L. Berrivani! Heger xelk bî metodê te dîza bigre gerek e êdi tu kes tişteki fêr nebe û nenivise.

Lê bînihêre (li gor mantiqa te) tu ji diziyê diki: Te navê koşeyê "Hindik-Rîndik" ji kovara Hawarê diciye û têda carna pêkeniyêñ xelkê dinivisi û qet behs ji naki ku te ji kijan weşanê û ji kijan zimanî wergerandiye. Mesela ew pêkeniyêñ ku bî "Maria" yan ji bî "Pablo Picasso" dest pê dîkin, bêşik ne yên kurdi ne.. (Zînarê Xamo - Hindik - Rîndik. Armanc hej. 88)

Disan dî hejmara Armancê ya 63'an, koşeyê "Lêkolin û Encam" da lêkolineke te heye bî navê "Dî diroka me de 'Bûyera 49'an' ". Te navê çend çavkaniyan nivisiye? (tenê derheqa rewşa girtigehê da ji pirtûka Dr. Şivan jêderkek girtiye) Tu wan 49 kesan gişkan nasdiki gelo? Listeya navêñ wan, meslekên wan, agahdariyêñ li ser rewşa wan ya dî mehkemê da, te ji kijan çavkaniyê girtiye? Qaşo nivis lêkolin e û navê koşeyê ji "Lêkolin û Encam" e ...

Gelo tu bî xwe dîkevi nav kijan grûba dizan?

Ev tenê çend nimûne ne, lê helbet ji diziya rexnegirê me ra dî Armancê da gelek nimûneyên din ji hene. Kesênu ku bixwazin dikarin hejmarê Armancê raçav bîkîn û bî hê-sani gelek nimûneyên dizitiya wi bibinin.

Lawkê Berrivani ji bo ku dizbûna min rînd isbat bike û xwendevanên Armancê bî vê yekê baş bîde bawerkîrin weha dibêje:

"Cardin X. Lezgin ji şireke Mestûre Xanîmê çend rîz wek nimûne dane, ku ew ji wergera ya swêdi ye. Yani ne wergera ji Farisi ya ji Kurdiya Gorani ye."

Tu çawa dizani min ji swêdi wergerandiye? Gerçi eger min du-sê rîz wek nimûne ji swêdi wergerandibe ji çi dibe? Ew rîz yên Mestûrê ne ya na? Ev gîring e. Lê rexnegirê dilovan, ne min, şairê Kurd Tosinê Reşit (Li Ermenistanê) ew wergerandiye kurmanci. Nîzanim gelo hewce dîkir min navê wergerê wan du-sê rîzan wek çavkani nişan bîda (?)

Tu dibêji ku dî data te da gelek kesen din ji hene ku tu dê rexne biki. Data te aloze bûye lê haya te jê tune. Feyda wê datayê tune, çimki di wê da virûsa zikreşiyê heye. Pir mixabin ku dîji wê virûsê, hina aliman tu program çene-kirine. Lewma tu mîjîyê wê datayê biguhrine.

Rexnegiri û zikreşî li hev nayêñ. Nabe ku meriv pêşda bîryara xwe bîde û bêje: "çî dibe bîla bîbe, dîvî illa ez filan kesi yan ji filan rojnamê û kovarê rexne bikim". Wê çaxê ew nabe rexnegirtin, navê wê devavêtin e. Ü devavêtin ji, beri herkesi zerarê dîgihine xwediyê xwe.

Bila rojnama Armancê û xwendevan li min biborîn ku uslûba nivisa min ji nêzkayî bî uslûba nivisêñ L. Berrivani kiriye. Lê ji bo têgihiştina wi biraderi ev tişt pêwist bû.

X. Lezgin  
21.8.1992

Ev nivisa han bî hêvi û daxwaza weşandinê ji rojnama ARMANC'ê ra hatiye şandin. Lê mixabin wê cih nedayê. Lewma, li ser daxwaza X. Lezgin Roja Nû wê diwesine.

RN.

### DI JİYANA GUNDİTİYÊ DA NAVGINÊN NAVA MALÊ Û DERDORA WÊ

|                       |                           |
|-----------------------|---------------------------|
| Sênc, çeper           | Dıst                      |
| Hewş                  | Dirne                     |
| Tifîk                 | Sitîl                     |
| Sênderek; sedir       | Satîl                     |
| Dîk                   | teşt                      |
| Deri                  | Niqîr                     |
| Axur                  | Tawe, mıqlık              |
| Tewle                 | Sihan                     |
| Gom                   | Teyfîk                    |
| Koz                   | Lengeri                   |
| Afir                  | Legan                     |
| Zilan                 | Sêni                      |
| Sitûn                 | Sêl                       |
| Alif                  | Piyan, tas                |
| Rewake                | kevçi                     |
| Ode, çavi, xurf       | Kevçidank                 |
| Menzel                | Hesk, çoçık, çemçik       |
| Kadin                 | Mexmer                    |
| Ka                    | Teşt                      |
| Çilo                  | Helal                     |
| Lod, diz              | Kefgir                    |
| Rêsi, xorûm           | Kêr                       |
| Kewar                 | Cetel                     |
| Ref, refîk            | Ískan, iskure, qedeh      |
| Kulek                 |                           |
| Eywan                 | Cer                       |
| Bermal                | Şerbîk                    |
| Qorzi                 | Kûz                       |
| Hewdîk                | Den                       |
| Holîk                 | Kûp                       |
| Bixêri, kuçîk, dustan | Dizîk                     |
| Qubalok, qubalek      |                           |
| Risle                 | Qatûf                     |
| Derabe                | Merkeb                    |
| Deri                  | Cembek                    |
| Sefîk                 | Zembil                    |
| Sépi                  | Selêk, selîk              |
| Lewleb, kêri          | Qafûr                     |
| Meşk                  | Sîfri                     |
| Dewkul                | Werqîl, sebil             |
| Ceft, surdar          |                           |
| Quşxane               | Coni, sindir              |
| Beroş                 | Mirkut                    |
|                       | Dankut, darkut, sersindir |
|                       | Sirkut                    |

Mehsere  
Cîrn  
Kûre  
Hewd  
Şire  
Keşmûl  
Çırık  
Textê çırıkê  
Guka çırıkê  
Pîrrik  
Kewt  
Nîkar  
Xuşil  
Botav  
Dîms, eqit, mewit  
Bastêq  
Meşlûr  
Kesme

Palan, Kurtan  
Navteng  
Zin, mareke  
Zangû  
Qûş  
Berwar  
Têrik  
Hefsar  
Gem  
Xışxışk  
Zengîl  
Pozik, bîzmûk  
Toq  
Zewr, badek, enişk  
Heçi  
Bendeke  
Weris  
Kertîk  
Kîndir

Çewal  
Ferd, ferdîk  
Tûr, tûrik  
Telis  
Cembek  
Xîrar, xaşı  
Kurcîk, heqîb

Doşek  
Lihêf  
Balif, balgi, zemberîş  
Rû (rûyê doşek an balgi)  
Çarşef  
Textê razanê  
Malvink, kêlin, kulin

Tej  
Cîl  
Cirax  
Berr  
Şalîk  
  
Ban, serê xani  
Bangeran, gundor  
QEysîk  
Şonîk  
Darberfk, mecirfe  
Sîvîrnek  
Çiranek, şiranek

Sîvnîk, gêzi  
Gezik, havlêk  
Tozmij  
Bêrok

Kûre  
Tenûr  
Manqel  
Maşik  
Sobe  
ardû, êzing  
Sotik, bizot  
Rûjik (sotikên agir ên vemirandi)  
Ari, xweliya agir, xulav  
Teraf

Dergûş, landik  
Qumatek  
Pêçek  
Paçik, pot

Şûjin  
Derziya gir  
Derziya hûr  
Dirêş  
Zixtik  
Filket  
Bîz  
Şîşik

Sol, pêlav, mîdas  
Çarox  
Qondere  
Cizme, lastik  
Lekan  
Lekaş  
Şîmîk  
Qabqabk

# ŞANOYA ZAROKAN

Cıwanık

Pîyes

(Şano xuya dike, ciya bı dar û kevir in, ser ciya çar mirov têne ditinê û jı hev balwale ne. Kari, pez û şwan ji xuya dikin. Qizek pir lawin-Zinê- li ser şanoyê ye).

**Zozan-** Ez Zozan im ez spehi me

Çar mirovan ez dizi me  
Jı gernasan bı hêvi me  
Min rizgar kın jı neyaran  
Kesk dikim hemû bîharan  
Xweş bikim ci, waran

(Koma zarokan bı listik derba-  
si ser şanoyê dibin û li hawir  
qizê (Zozan) dileyzin û bı des-  
tê hev digrin û li dora wê  
dizvîrin û dibêjin)

**Koma Zarokan:**

-Tu zozan i tu spehi yi  
Çar mirovan tu dizi ye  
Jı gernasan bı hêvi yi  
Te rizgar kın jı neyaran  
Kesk bikin hemû bîharan  
Xweş bikin ci, waran

**Zozan-** Ez jı we ra bêjim  
çirokan, ez pır zanım çirokan.

**Koma Zarokan:-** (Bı stran  
dibêjin)

Bo me bêje çirokê  
Çend gotinan jı dirokê

**Zozan-** Ez ê bo we bêjim çiroka  
"Mem û Zin"

**Koma Zarokan:-**

Şevez reş bû, şev tari bû  
Mem û zin raketî bûn  
Du cînan Zin dîzibûn  
Lî ba Memê ew danibûn

(Koma zarokan bı hev re)

- Em vê çirokê zanîn.

**Zozan-** Ez ê çiroka "Dêwê çar  
seri" jı we ra bêjim

**Zarok 1-** (Bı dengê sítûr û  
bilind) Hebû nebû, hebû dêwe-  
ki çarseri.

**Zarok 2-** Serê wi weke kerekî  
mezîn.

**Zarok 3-** Çavê wi weke fenosê  
mezîn.

**Koma Zarokan:-** (*Bı hev ra*)  
Dêwê çarseri ye  
Bêbext û fitneci ye  
Dayika me jî me diziye

**Zozan-** Hım... mmm.... Ez bo we  
bêjim çiroka Cîwanikê.

**Koma Zarokan-** (*Bı hev ra*)  
· Çiroka cîwanikê!!!  
Bo me bêje vê çirokê  
Çend gotinan jî dirokê  
Bêj! hebû nebû rojek hebû.  
Rehma xwedê li bavê we bû.  
**Zozan-** Geli koma zarokan (za-  
rok li hev kom dibin). Hebû  
nebû, rojek jî rojan, rehma  
xwedê li bavê besdar û guhda-  
ran. Hebû Cîwanikeke pîr la-  
win û nazık û delal. Ev Cîwani-  
kê delal li holeke pîr bî giya  
dîçêriya û dileyist. Bî kîf û  
şahi çar mîrov hatin ba Ci-  
wanikê. Herçar mîrov (Gur, to-  
rik, rovi û keftar) sîlav li Ci-  
wanikê kîrin.

**Zarok 1-** Dayika Zozan, ev  
herçarênu ku hatibûn ba  
Cîwanikê çî dixwazin?

**Zozan-** Dîxwazin wê bîxwin...,  
lawê min.

**Zarok 2-** Çîma wê Cîwanikê  
bîxwin?

**Zarok 3-** Herçar mîrov,  
mîrovênu bêbext in.

**Zarok 4-** Dayika Zozan, hola bî  
giya û gul a ku Cîwanikê lê  
dîçêriya, hola van herçar  
mîrovan e yan na?

**Zozan-** Na..., na qiza min, hol  
ne ya herçar mîrovan e.

**Zarok 5-** Paşê dayika Zozan çî  
çêbû, em dixwazin zanibin ku

çawa van herçar mîrovan  
dixwazin Cîwanikê bîxwin û bî  
çî rengi dixwazin Cîwanikê  
wînda bikin?

**Zozan-** De baş e lawê min,  
werin li min kom bîbin bo  
bêjim çiroka Cîwanikê.

(*Li qorziyeki şanoyê zarok li  
Zozan kom dibin*)

Geli koma zarokan, dema ku  
herçar mîrov hatin ba  
Cîwanikê, wek min got herçar  
rovi, torik, gur û keftar...  
(*Rohniya şanoyê hêdi hêdi  
kuri (kêm) dibe*)

### **PERDA DUYEM**

(Rohni li ser Zozan û koma  
zarokan kurik e û hêla şanoyê  
rohni dibe. Em li ser şanoyê  
rovi, torik, gur û keftar û  
Cîwanik (hesp) dibinin)

**Rovi-** Geli birayan, werin emê  
gunehê xwe bêjin û kesê ku  
gunehê wi pîr bin, em ê wi  
bîxwin.

**Gur-** Birayê rovi jî kerema xwe  
ra carek dîn bêje, tu çî dixwazi  
bêji ez tênegihiştîm.

**Rovi-** Birayê gur, her kesek jî  
me gunehê xwe bêjin û mîrovê  
ku gunehê wi pîrtir bin em ê  
goştê wi bîxwin.

(gur, torik, û keftar bî hev ra)  
me qebûl e.

**Gur-** Ez dixwazim hûn alika-  
riyê bî Cîwanikê ra bikin, bîla  
Cîwanik dawiyê gunehê xwe  
bêje.

(*Rovi, torik, keftar bî hev ra*)

me ev gotin ji qebûl e.

**Rovi-** Geli bîra, ez ê pêşî gunehê xwe bêjim. Hûn min nas dîkin, ez rovi me. Ez diciûm gundêñ dûr, bî dîzi diketim qınıkêñ (koxikêñ) mîrişkan û min hemû dîkuştin û dixwarin. Min nedîhişt yek sax bifilite..

**Gur, Torik û Keftar bî hev ra-**  
Birê rovi, gunehêñ te ne tiştek in..., te guneh nekîrine.

**Torik-** Geli birayan, dora min e ku ez ji we ra gunehêñ xwe bêjim. Ez torik im. Dema bîhar şin dibû, mîrişk û qazan çiçik derdixistin. Ev çiçik li dora gund dicierryan dî vê demê da. Min xwe dîqelizand û diciûme wan. Min hemû dixwarin û dîkuştin. Min yek sax bernedîda. Ev bû gunehêñ min geli birayan.

**Gur, Rovi û Keftar bî hev ra-**  
Ma ev ji guneh in birayê torik..  
Te tu guneh nekîrine.

**Keftar-** Geli birayan, ez keftar im û ji min ra dibêñ pîr feqira deng nakê, loma ji min ra dibêñ: "şaka paka teyşikan (ling) qûlka deng nake. Geli birayan, min xwe tim bî şev berdîda gundan û diketim qınıkêñ mîrişkan, min mîrişka tev dîkuştin.

**Gur, Torik û Rovi bî hev ra-**  
Gunehêñ te pîr bicûk in birayê keftar.

**Gur-** Geli birayan, ez gur im.

Ez diciûm çiyan û çolan. Ez xurt im weke ba me. Bi şev diciûme gundan û diketim hewşan ji. Min ci bigirta, min. ê bikuşa, dewar bûya yan pez bûya. Heger şevekê diranêñ min bî xwin nebûna, wê şevê xewa min nedîhat... Min yek li pêsiya xwe sax bernedîda. Ev e gunehê min kiri.

**Keftar, rovi û torik bî hev ra-**  
Birayê gur, te guneh nekîrine, gunehê te pîr bicûk in.

**Ciwanik-** Ez ciwanik im. Ez kehêl im. Rojeki ji rojan, dawiya bîharê bû, ez derbasi baxceki bûm û bî şashi pelek ji pelên xasê min xwar. Lî ez zû bî xwe hisiyam û min got: "guneh e" û ez vegeiyam. Ev e gunehê min kiri.

**Gur-** Gunehêñ te pîr mezîn in Cwanikê!..

**Keftar-** Gunehê ku te kiriñe, keseki li vê dînyayê ew nekîrine!..

**Torik-** Gunehê te mîzin in, nayêñ efûkîrinê!..

**Rovi-** Ciwanikê! tu dizani ew pelê xasê ku te xwari, ew pel wê mezîn bibûya û bîzir bigirta û wê ew bîzir biçandina û bî hezaran ji wê çê bibûna...  
Gunehê ku kiriñe, pîr mezîn in.. Divê em te bîxwin.

(Herçarêñ rêzê berdîdin  
Ciwanikê, dengê gur, rovi, keftar û torik tê)

**Gur, Keftar, Rovi û Torik bî**

## **hevra-**

Gunehê te gîran e  
Canê te ciwan e  
Dîvê em te bixwin  
Bixwin bî diran e.

(Ciwanik dî nav wan da baz  
dide, dike şîhe şîh û dibêje)

**Ciwanik-** Ez ciwanik im, ez  
ciwan im  
Ez kîhêl im, serbilind im

Ez beza me, weka ba me  
Serbilind im hemû dem e

(Gur, rovi, keftar û torik êrişê  
dibin ser ciwanikê, hêdi hêdi  
rohni kêm dibe û perde tê  
girtin)

## **PERDA SISIYAN**

(Rohni dide cihê Zozan û  
koma zarokan, hêdi hêdi şano  
hemû rohni dike)

**Zozan-** Geli koma zarokan, we  
çî dit û fehm kir ji vê çirokê?  
**Zarok 1-** Neheqi pîr xwiya bû!  
**Zarok 2-** Xwinmêji pîr xurt bû!  
**Zarok 3-** Bêbexti ji xwe ra zana  
bû!

**Zarok 4-** Zordari ji me va xuya  
bû!

**Zarok 5-** Serhildan gernas bû!

**Zozan-** Geli koma zarokan,  
gotina xwe bêjin.. Hûn heq  
dîdin Ciwanikê yan heq dîdin  
gur û hevalên wi?

(Zarok bî destê hev dîgrin û li  
dora Zozan dizvirin. Zozan ji di  
nava wan da dizvire)

## **Koma Zarokan- (bî listik)**

Bimre bêbext û zordar!

Bimre gur û keftar!

## **Zozan- (bî listik)**

Bimre bêbext û zordar!

Bimre gur û keftar!

**Koma Zarokan-** Biji gernas û  
zozan!

Biji ciwanik û serhildan!

**Zozan-** Biji gernas û zozan!  
Biji ciwanik û serhildan!

**Koma Zarokan-** Bimre çeqel  
û rovi!

Bimre dêwê çarseri!

**Zozan-** Bimre gur û keftar!  
Bimre pis û koledar!

(Koma zarokan û Zozan bî hev  
ra, bî listik)

Bimre gur û keftar!

Bimre bêbext û zordar!


Bimre torik û rovi  
Bimre dêwê çarseri

Biji zozan û gulistan!  
Biji koma zarokan!

## **DAWI**

A. Ç. Canpola

Langenhorn D. 15'ê Nisanê, 1992



Ji Navçeya Qendilê didemek